Bidestveanîna mafên neteweyî yên gelê Kurd di çarçoveya Îranek Demokratîk û Federal de

Hejmar: 100

30’ê Çiriya Paşîn a 2008

Buha: 150 Tûmen

agiri

Duheftînameya siyasî, civakî, çandî û hunerî

Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne

**Peyama Rêzdar Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî Yê PDK Îranê Ji Bo Barak Obama Û Bersiva Wî**

Rûpela 5

# 100’EMÎN MÛMA AGIRÎ DI TEMENÊ ŞEŞ SALIYÊ DE HATE TEYÎSANDIN



**RONÎ**

Quncikek ji bo şiroveya bûyer û babetan ji xwendevanên "Agirî" re



**Ebdullah Hicab**

# Her Ew Kêm Bû

Bi diyarîkirina **Sadiq Mehsûlî** weke Wezîrê nû yê Hundir ê Komara Îslamî, beşek din ji pilana derbazkirina desthilata birêveberiya Îranê bo fermandarên Sipaha Pasdaran kete jiyanê. Mehsûlî di wan 29 salên piştî hatine ser kar a Komara Îslamî, di wezîfeyên cuda yên eskerî û ên sivîl ên girêdayî bi Sipaha Pasdaran de, weke Pasdar, Qaymeqamê Urmiyê, cîgirê Parêzgarê Azerbaycana Rojava û fermandarê hêza herêma 5 û leşkerê 6 yê Sipaha Pasdaran û damezirênerê leşkerê Aşûra kar kiriye û kesê herî nêzîk ê Mehmûd Ehmedînijad e.

Ji ber desthilata xwe ya xurt a eskerî, Mehsûlî torek berfireh ya bazirganiyê jî li Urmiye û parêzgeha Azerbaycana Rojava damezirandiye ku di nava demek kurt de dahat û heyîna wî gehandiye astek ji hesabê bi der. Di heman demê de şîrketên wî ên bazirganiyê ketine nava bazirganiya bi nift (petrolê)ê ve girêdayî û di wî alî de jî ew kirine xwediyê desthilat û sermayeyek bê rêje. Bi kurtî û kurmancî, Mehsûlî bi riya Sipaha Pasdaran ve desthilata serbazî bi dest xistiye û ew desthilat kiriye bingeh ji bo bidestxistin û xurtkirina desthilatek pitir ya aborî.

Digel ku Parlemanê deng dabe Mehsûlî jî, lê pirr nîşane hene ku derdixin diyarîkirina wî bi xwestina Elî Xameneyî, rêberê olî bûye û bi rewşa siyasî ya rojê a Îrane ve girêdayî ye. Xameneyî di çendîn hilkevtan de ji Ehmedînijad re daye xuyakirin ku hêviyên wî hene ew ji bo heyv û salên kirîtîk ên pêşiya me amade be. Daxwaza Xameneyî ji Ehmedînijad tê wê manayê ku rêberê olî û hêzên Sipah û Besîc ku girêdaiyê wî ne, pilan dikin di salên pêşiya me de, ku ji bo qedera rejîma Komara Îslamî qonaxa herî giring e, desthilata birêveberiya welat bidin dest fermandarên pêşîn ên Sipah û Besîc.

Projeya karê wezîrê nû ku di nameya wî ji bo Parlemanê de hatiye eşkerekirin, tu gumanê nahêle ku ew dê wezîfeya xwe çawa birêve bibe. Serxalên karê wezîrê nû weha tên rêzkirin: pêkanîna zemîneya beşdariya berfireh di hilbijartina Serokkomariyê de, parastina ewlekariya civakî, xesarnasiya karê partiyan û amadekirina "atlas" an xerîteya rêxistinên dijber.

Eger mirov bi erka ragehandî a yekem dest pê bike, diyar dibe ku Xameneyî ber hindê Mehsûlî aniye ser textê Wezareta Hundir ku garantiya biserxistina Mehmûd Ehmedînijad di hilbijartina pêşerojê de bi dest bixe. Mehsûlî dizane ku pirraniya xelkê li Îranê, bi taybet li herêmên ku neteweyên bê maf lê dijîn, bi xwestina xwe di hilbijartinên Komara Îslamî de beşdar nabin. Di hilbijartina dewra pêşîn a Serokkomariyê de, serbarê vê yekê ku hêzên Besîc û Sipah li gellek deveran bi gefan û bi zorê xelik neçar kirin herin ser sindûqên dengdanê, lê dîsan jî rêjeya beşdariya hilbijartinê li gellek bajarên Kurdistanê ji seda pêncî kêmtir bû. Ew bi xwe nebûna meşrûiyeta rêjîmê li cem komên xelkê nîşan dide.

Niha piştî derbazbûna sê sal û nîv bi ser dewrana yekemîn a Serokkomariya Ehmedînijad û eşkerebûna neşiyana wî di çareserkirina pirsgirêkên welat de, xwesteka beşdarbûn li hilbijartinê hê kêmtir bûye. Eger bê û li herêmên dî ên Îranê, xelk mîna Kurdistanê neçin ser sindûqên dengdanê, wê demê hemû meşrûiyeta sîstemê dikeve ber pirsê. Lewma Mehsûlî niha tînin meydanê ku bi şantaj û gef û îmkanên xwe yên serbazî û darayî, her çawa be hinekê rêjeya beşdariya di hilbijartinê de bibe evraz.

Pirsgirêka sereke ew e ku Mehsûlî di demekê de dixwaze pitir xelkê beşdarî pêvajoya diyarîkirina Serokkomar bike ku tenê mekanîzma di destê rêjîmê de kar dike, zext û zor e. Lewma tê çaverêkirin ku li hember pilanên Mehsûlî û Ehmedînijad nerazîbûnên girseyî xurt bin. Ji bo ku ew nerazîbûn nebin şîpel(pêl)ek xurt ku gefan ji hebûna rêjîmê bike, Mehsûlî xala duyê a bernameya karê xwe ji bo "parastina ewlekariya civakê" daniye.

Dema mirov temaşeyî gefên di wan çend salan de li ser civaka Îranê dike, diyar dibe, mebesta Wezîrê nû yê Hundir çi ye. Li Kurdistan, li Belûçistan, Tukemen Sehra, Ehwaz, Azerbaycan, Tehran û hemû deverên dî ên welatê pirrnetewe yê Îranê bi salan e ku bi tenê Pasdar û Besîcên ku bi destê kesên mîna Mehsûlî û Ehmedînijad hatine perwerdekirin, ji ewlekariya xelkê û a civakê re tehlîke ne. Dema di civakê de kêr digehe hestî û xelk li hember gef û zordariya Sipah û Besîcan de dijkiryarê nîşan dide, dubare her hêzên ewlekariyê ne ku ewlekariyê tevlihev dikin. Lewma ji niha ve derdikeve ku Ehmedînijad û wezîrê wî ê nû amadekariya hindê dikin desthilatek pitir bidin Sipah û milîşên Besîcî ku bi keyfa xwe her dem û her devera ku dilê wan xwest, bi hêceta parastina ewlekariya civakî, dest bavên mal û can û çarçoveya jiyana taybet a xelkê.

Mijarek din a giring bo wezîrê nû yê Ehmedînijad ew e ku partiyên nû ên li welat serî hildanî, bixe çarçoveyek hê berteng ku bi tenê bi ferman û xwesteka Xameneyî, Ehmedînijad û Sipah û Besîc kar bikin. Lewma Mehsûlî basî xesarnasiya karê partiyan dike û dixwaze bizane ka ew partiyên ku di çarçoveya sîstemê de kar dikin, heta ku xizmeta berjewendiya wê beşa desthilatê dikin.

Nayê veşartin ku li Îranê tiştek weke partiyên siyasî yên serbixwe mana nîne. Ew çend grûpên di wan çend salên dawîn de bi îzna rejîmê û di çarçoveya sîstema 'Wilayeta Feqîh' de serî hildane, hemû girêdayî qanûna giştî ya rêjîmê ne ku li binî re dijî xebata siyasî û têkoşîna azad a partiya ne. Lê niha eşkere dibe ku Ehmedînijad û grûpa wî a di bin fermana 'Weliyê Feqîh' de nikarin taba xebata wan çend grûpên ji rêjîmê re bê tehlîke jî bînin.

Lê erka herî bingehîn a wezîrê nû, li gor pilana ku wî pêşkêşî Parlemana rêjîmê kiriye, amadekirina xerîteya rêxistinên siyasî yên dijber e. Dema mirov temaşeyî dosya Serokkomar û Wezîrê wî ê nû yê Karê Hundirîn dike, tê xuyakirin ka dê ew xerîte bi çi awayî bê amadekirin û kîjan rêxistin dê bi çi mebestê di nav de cîh bigrin. Ji sala 1979 û pêve, li pirraniya operasyonên leşkerî yên Sipaha Pasdaran li dijî xelkê Kurdistanê, Ehmedînijad û Mehsûlî beşdar bûne û weke dijminê herî serhişk ên gelê Kurd têne naskirin. Ew her weha endamên herî pêş ên tîmek ji berpirsiyarên Sipaha Pasdaran bûn ku li pilandanan û birêvebirina siyaseta rêjîma nû li hember gelê Kurd rola herî bilind hebûne. Piraniya operasyonên derveyî sînoran ên li dijî tevgera Kurdistanê hatî meşandin jî an bi agadarî an bi fermana wê tîmê hatine birêvebirin.

Mebesta wezîrê nû ji diyarkirina xerîteya rêxistinên dijber ew e ku bizane potansiyela xurtbûna wan rêxistinan di dema guhertinê de çend e, ku li gor wê pilana serkutkirinê amade bike. Di serî de dê rêxistinên Kurd bibin armanca operasyonên îhtimalî yên rêjîmê. Li gor wê yekê dûr nîne ku pilana teror û reşkujiya ku di salên 80 û 90'î de bi fermana Ehmedînijad û Mehsûlî û heval û hevbîrên wan dihat meşandin, dubare bikeve rojevê. Ji tîma cinayetê a îro Îranê di asta herî bilind de birêve dibin, heya niha rola Mehsûlî veşartî bû. Bi erka nû, dê ji niha û pêve ew rol bi awayekî servekirî bê meşandin.

www.arsivakurd.org

# Hevpeyvînên Taybet Bi Hilkevta 100’mîn Hejmar Û Şeş Saliya Agirî


Bi henceta 100’emîn hejmara duheftînameya ‘Agirî’ û şeş saliya weşanê, me bi hewce zanî ku rapirsiyeke giştî raberî çendîn kesan bikin ku di vê hejmara taybet hatiye cihkirin. Ji ber kêmbûna cih hinek bersivên beşdaran ji bo hejmara tê mane û her wiha di vê hejmara Agirî de me nekarî bi awayekî berfireh bi gellek kesan re hevpyevînê pêk bînin. Bi taybet ji ber pirsgirêkên ewlekariyê me nekarî tevî Kurdên Urmiye, Xoy, Makû û Selmas û bajarên din ên Rojhilatê Kurdistanê vê pirsên bînin berbas. Em hêvî dikin ku piştî derketina hejmara 100 û xwendina wê jî, nirxandina xwe li ser xebata 100 hejmarên ‘Agirî’ ji me re bişînin. Em bi dil û can wan kesan ku me rexne dikin, têdîtin û pêşniyarên xwe tîne berbas spas dikin... Pirsa hevpeyvînê a taybet ev e:

**Pirs:**

**Roja 30.11.2008’an, 100’mîn hejmara Duheftînameya Agirî derdikeve, herwiha 6’mîn salvegera weşana me ye jî. Nirxandin û nêrîna we li ser kar û xebat û xizmetên 100 hejmarên derketî ên Agirî bi ziman, çand, rojnamegerî û rewşenbîriyê çi ye? Rexne û pêniyarên we çi ne?**

**Mistefa Hicrî:**

## “Cihê Rûmetê Ye Ku Agirî Ji Aliyê Çend Pêşmergeyên PDKÎ Tê Weşandin”



Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî yê PDKÎ

Di destpêkê de bi hilkevta derçûna 100’emîn hejmara rojnameya we (Agirî), pîrozbahiyên germ û mandînebûnê dibêjim we. Bêguman çap û belavbûna van sed hejmarên Agirî, encama erk û têkoşîna we komek ji Pêşmergeyên xebatkar ên PDKÎ û Komîsyona Çapemenî ya partiyê bi giştî ye.

Li gor hinek zanyariyan ku ji aliyê kesên dilsoz û şareza li ser zaravê Kurmanciya Jorîn gihîştine min, Agirî di warê naverok û ziman de û herwiha di warê xizmetkirin bi rojnamegeriya kurdî de karî ye bi bandor be û xizmetê bi perwerdekirin nifşekê ji bo zindîragirtina zimanê Kurdî û dewlemendkirin û parastina ziman û çanda Kurdî bike û bala xwendevanan bo aliyê xwe bikişîne.

Ez hêvîdar im eva bixwe handerek be ji bo ku hûn bi armanca dewlemendtirkirina hejmarên tê ên vê weşanê zêdetir bixebitin.

Destên we xweş bin, hêviya min serkevtina we ye.

**Mihemedsalih Qadirî:**

## “Agirî Coxîna Ziman Û Çanda Kurdî Dewlemend Kiriye”



Mihemedsalih Qadirî, Siyasetvan û yek ji damezrênerên “Agirî”

Di berahiyê de şeşemîn salvegera weşana Agirî ji damezrêner, xebatkar û xwendevanên birûmet ên wê pîroz dikim.

Ji bo nirxandin û berhevdana xebata Agirî, ya baş ev e ku em vegerin bo bîroka destpêbûna wê, armanc û hewcehiya jidayîkbûna vê rojnameyê, hingê dê xuya bibe ku Agirî heta çi qasekê kariye di erkên xwe de bersivder be. Lewra dikarim bêjim Agirî piştî wan hewl û xebatên micid ku ji aliyê komek ji hizrmend û evîndarên rojnamevaniya Kurmancî, di nav refên PDKÎ de, bi êş û janên taybetî ji dayîk bûye.

Sergotarên hejmara 1 û 2 a Agirî ku bi navê “Çima Agirî” û ... bi zelalî pênase, bîroke û pêwîstiya weşana vê rojnamê şirove dike.

Wek yek ji damezrênerên rojnameya Agirî, bi serbilindî ve dikarim bêjim, Agirî tevî hebûna gellek pirsgirêkên cur bi cur di warê madî, teknîk û personelên profesyonel di karê rojnamevaniyê de, bi xebat û keda evîndar û xebatkarên wê pirojê, kariye di erkên xwe de heta qasekî berbiçav serkevtî be.

Agirî bi 100 hejmar berhemên xwe ve kariye bi tîpên Latînî û devoka Kurmancî a Jorîn, coxîna ziman û toreya Kurdî dewlemend bike û cihê xwe di nav rojnamegeriya Kurdî de veke.

Agirî weke pir û zimanê veguhastinê, çand, tore, bûyer û êş û janên Rojhilatê Kurdistanê bo neteweya Kurd li beşên din ên Kurdistanê veguhezîne. Agirî karî bi terzek fermî taboya yekcemseriya weşana Kurdî li Rojhilatê Kurdistanê bişkêne û bi rêbazeke nû û welatparêzî hembêza xwe bo weşan û hevnêzîkkirina devokên şirîn ên zimanê Kurdî veke.

Agirî piştî weşandina 100 hejmaran êdî bûye qutabxaneya perwerdekirina çand û ziman û rojnamevaniya Kurdî, weke Çiyayê Agirî bi serbilindî teşiya temendirêjî û pêşveçûnê dirêse.

Şanazî bo PDKÎ ku Agirî di hembêza xwe de afirand û kire rêbazek nû di weşana nivîskî ya rojnamevaniya Rojhilatê Kurdistanê de. Qawet û serkevtina zêdetir bo xebatkarên newest û rêzdar ên Agirî.

**Hesen Şerefî:**

## “Ez Pirr Kêfxweş İm Ku Agirî Di Heyamê 5 Salên Borî De Berdewam Û Bêwestan Pêvajoya Xebata Xwe Ya Rojnamegeriyê Domandiye”



Hesen Şerefî, Cîgirê Sekreterê Giştî yê PDKÎ

Xebata çapemeniyê û weşandina rojname û kovaran bi zimanê Kurdî di nav PDKÎ de, derbasbûyiyeke dûr û dirêj heye û digel avabûna vê partiyê, xebata han a ragihandinê her hebûye. Lê derkirina weşanekê bi tîpên latînî û devoka Kurmanciya Jorîn vedigere bo 6 salan berî niha ku wê demê min wekî berpirsiyarê Komîsyona Çapemeniya PDKÎ’ê, rûmet û şanaziya hevkarî bi xebatkar û kargêrên wê komîsyonê hebû. Wê demê li ser pêşniyara hinek hevalên partiyê û heta tekezkirina hejmarek ji personelên Komîsyona Çapemeniyê ku şarezayê zaraveya Kurmancî û nivîsîn bi tîpên latînî bûn, pirsa hewcehiya rojname an kovarek bi devoka Kurmanciya Jorîn û bi tîpên latînî hate holê. Ew pêşniyare bi armanca vê yekê hate holê ku dîtin û nerîn û herwiha helwest û siyasetên PDKÎ ji bo wan xûşk û birayên Kurd li parçeyên din ên Kurdistanê ku bi zaraveya Kurmancî û tîpên latînî diaxivin û dinivîsin, bihê rohn û şîrovekirin.

Bi xweşî ve, ew pirs û pêşniyare di Polîtbîroya partiyê jî weke hewcehiyekê hate dîtin û biryara weşandina ‘**Agirî**’ hate dan.

Niha ku 100’emîn hejmara Agirî derdikeve, ez pirr kêfxweş im ku Agirî di heyamê 5 salên borî de berdewam û bêwestan pêvajoya xebata xwe ya rojnamegeriyê domandiye û ew valahiya ku ji ber nebûna weşaneke weke Agirî di holê de bû, hatiye tejîkirin.

Derketina sed hejmarên Agirî di heyamê 5 salên borî de, ne tenê bandoreke erênî û mezin li ser ragihandina siyaset, helwest û dîtin û nêrînên PDKÎ bi zaraveya Kurmanciya Jorîn hebûye, belku xizmetên berbiçav bi ziman, çand, wêje, rojnamegerî û rewşenbîriya Kurdî jî kiriye ku eva bixwe jî her di çarçoveya girîngîdana PDKÎ bi van mijarane ye.

Di vê hilkevtê de, ez pîrozbahiya 100’emîn hejmara weşana Agirî ji xebatkarên rêveber ên Agirî, Komîsyona Çapemenî a PDKÎ bi giştî û ji PDKÎ û hemû hogir û xwendevanên vê rojnameyê dikim û hêviya serkevtin û pêşdeçûna zêdetir jê we re dixwazim.

www.arsivakurd.org

# 100’EMÎN HEJMAR Û ŞEŞ SALÎYA AGIRÎ PÎROZ BE

Xwandevanên hêja ên Agirî! hejmara yekem a weşana Agirî di Çiriya Paşîn (November) a sala 2003’an de hate weşandin û kete nav qada rojnamegeriya Kurdî. Hejmara 1 heta 22 a Agirî, mehane derdiket, lê ji hejmara 23 heta vê hejmarê (100), pandeh rojan carekê hatiye çap û belavkirin. Agirî yekemîn weşana xwerû Kurmancî bi tîpên latînî ye ku heta niha li Kurdistana Rojhilat tê weşandin.

Ji ber ku xebata partiyên siyasî ên azadîxwaz ên Rojhilatê Kurdistanê bi giştî û nemaze PDKÎ bi tevahî qedexe ye, kurd û gelên din ên Îranê ji hemû azadiyekê û yek ji wan azadiya medya û çapemeniyê bêpar in, ev yek bûye sebeb ku partiya me û yên din xebata medyayên xwe li derveyî sînorên Kurdistana Îranê rêve bibin. Bona tejîkirina vê valahiyê, PDKÎ ev gav avêt. Lewra Agirî weke weşaneke PDK Îranê li binkeya Komîsyona Çapemeniya vê partiyê li Kurdistana Başûr û ji aliyê desteyek ji Pêşmergên şoreşger û welatparêz ên Kurd dest bi weşana xwe kir û niha jî her didome. Xebata 100 hejmarên Agirî bi ked, zehmet û mandîbûna wan bûye. Her wiha Agirî bi armanca meşandina erkê nasandina PDK Îranê û pêşvebirina siyasetên partiyê û xurt û berfirehkirina pêwendiya vê partiyê û Bakurê Kurdistanê, Rojavayê Kurdistanê û Bakûra Kurdistana Îranê – ku piranî Kurmancîaxiv in – û her wiha bi armanca avakirina pirekê di navbera Kurdên Kurdistana Rojhilat û Kurdên parçeyên din yên Kurdistanê bi Zaravê Kurmancî dest bi xebata xwe kir.

Ji bilî wan armancên giştî, Agirî hinek armancên din ji bo çarçoveya çalakî û xebata xwe ya rojnamegeriyê destnîşan kirin ku bi vî awayî ne: parastin û pêşdebirina ziman, wêje, çand û kultûra kurdî, berfirehtirkirina zanyariyên civakî, çandî û siyasî ên civaka Kurdistanê, xebat û çalakiyên aborî ên Kurdan, bas û gotûbêj li ser pirsgirêkên ciwanan û malbatên kurd, perwerde û hînkirin, edalet û wekheviya civakî, tendurustî, arîşeya bixeter a madeyên hişber û betalî û bêkariyê, deng û basên Kurd û Kurdistanê û bûyer û boneyên neteweyî û partiyê.

Heta çiqas Agirî di bicîanîn û şopandina wan armancên xwe yên pîroz de serkevtî bûye, bila xwendevanên Agirî bi xwe îtirafê bi vê yekê bikin û bînin ziman. Lê em soz didin ku dê li ser xebat xwe mikûm bin û hewl û bizava me ya rojane û berdewam ev e ku guhertinên hewce di hemû warên xebata Agirî ya çapemeniyê de pêk bînin. Em daxwaz dikin ku hemû kes û aliyek bona vê yekê bibe hevkar û alîkarê/a me…

Di vê hilkevtê de, Desteya Weşana Agirî, spas, pêzanîn, destxweşî û mandînebûnê dike ji hemû hevalên rêveber û xebatkarên Agirî û nivîskarên heval û hevkarên Agirî’yê ku berdewam bi nivîsar û quncên xwe û herwiha rexne û pêşniyarên xwe jî alîkariya domkirina temenê Agirî kirine, û bi rêz û hurmet ve ked û zehmeta wan bibîr tîne…

**Detseya Weşana Agirî**
**30.11.2008**

**Serbest Urmiye:**

## “Agirî Gellek Nivîskar Û Rojnamevanên Naskirî Li Dora Xwe Civandiye”



Serbest Urmiye
Rojnamevan

Îro hejmara 100’mîn ya Rojnameya Agirî derdikeve. Rojnameyek ku di temenekî kin de karî dergehekî nû ji bo nasandina xem û taliya gelekî hejar veke. Rastî û rastbêjî sedemek din bû ku Agirî di dilê xwendevanên xwe de cih bigire. Anîna rojnamevan û nivîskarên naskirî û bihêz yên weke **Temûrê Xelîl**, **Adar Jiyan**, **Prof. Celîlî Celîl** û ... di nava rûpelên xwe de, hêz û giraniyek din da Agirî. Ji aliyekî din ve jî ev rojname bû tirîbûnek ku di seranserî cîhanê de Kurd, nemaze Kurdên ku bi devoka Kurmanciya Jorîn dipeyivin, bi kul û derdên hev bihesin û peyama şoreşa xwe bigihînin hev.

Di dawiyê de hêvîdar im ku Rojnameya Agirî û hemû rojnameyên din ên Kurdî girîngiyekî taybet bidin aliyên perwerdehiyê bi taybetî perwerdehiya ziman. Hêvîdar im her berdewam bin.

**Rostem Cehangîrî:**

## “Derketin Û Weşana “Agirî” Di Cih Û Dema Xwe De, Şoreşek Bû Di Ragihandina Kurdistana Îranê”



Rostem Cehangîrî, endamê Deftera Siyasî ya PDKÎ

Bi raya min derketin û weşana vê balavokê di cih û dema xwe de şoreşek bû di ragihandina Kurdistana Îranê û bi taybet ya Partiya Demokrata Kurdistana Îranê de.

Biryara weşandina rojnameyek bi navê **Agirî** bi devoka Kurmanciya Jorîn û bi tîpên latînî ji aliyê rêberiya partiyê ve gellek hewce û di cih de bû, çunkî heya wê demê him rexneyek bû li ser partiyê, him jî kêmasiyek bû di nav ragihandina partiyê de.

We bi ked, zehmetî û mandîbûna xwe nîşan da ku hûn dikarin û dê bikaribin di qeda îlm û zanistê de serbikevin û him pêgehek baş ji xwe re bibînin û him jî xizmetek berbiçav bi ziman û rojnamevaniya kurdî bikin. Ez xatircem bûm ku hûnê bikaribin ser bikevin û serê me bilind bikin. Niha ku em dibînin hejmara 100’ê derdikeve, mirov pirr keyfxweş dibe û şanaziyê bi we û xebata we dike. Bi rastî Agirî gellek dewlemend û têrnaverok e û cî û pêgehek baş û bilind û cihê hitbar û baweriyê di qada rojnamevaniya kurdî de bidest xistiye.

Ez hêvî dikim ku hûn di xebata xwe de berdewam û serkevtî bin û ger îmkan hebe dema weşana we ji 15 rojan bo 7 rojan kêm bibe. Dîsan we silav dikim û xebat û tekoşîna we bilind dinirxînim û 6’mîn salvegera Agirî û hejmara 100’mîn ji we û hemû xwendevanên Agirî pîroz dikim.

---

**Irfan Rehnimûn:**

## “Nabe Ku Ji Bo Avakirin Û Çêkirina Zimanê Standard Yê Kurdî Tenê Zaraveyek Weke Bingeh Bihê Girtin”



Îrfan Rehnimûn, endamê Komîteya Navendî a PDKÎ

Mixabin! ji ber ku Kurdistan ji aliyê dagirkerên Kurdistanê ve, hatiye parçe perçekirin û me dewleteke neteweyî tune ye ku bikare ji rêya zanayên warê ziman ve kar bona piraktîzekirina zimanê standard yê Kurdî bike, zaravayên zimanê Kurdî nemaze Kurmanciya Jorîn, Naveresat û Jêr, derfeteke zaf ya jiyana bi hevdu re hene û îmkana vê yekê tune ye ku ji bo avakirin û çêkirina zimanê standard yê Kurdî tenê zaraveyek weke bingeh bihê girtin. Lewra bi neçarî di nivîsîn û ragihandinê de bi wan her sê zaravan mifahê tê wergirtin.

Rastiya wê eva ye ku %70 ji akinciyên Kurdistanê, yanî Kurdistana Bakûr û Rojava û parek ji Rojhilat û Başûrê Kurdistanê û Kurdên niştecih ên welatên Yekîtiya Soviyeta berê û pirraniya herî zaf a penaberên Kurd ên derve (taravgeyê) bi zaravê Kurmanciya Jorîn diaxivin, lewra em nikarin çavê xwe ji wê rastiya heyîn bimiçînin û nebînin. Ji ber vê yekê, Komîsyona Çapemenî a PDKÎ çend salek dibe ku duheftînameya ‘**Agirî**’ bi Kurmanciya Jorîn û tîpên latînî diweşîne û niha weşana wê gihîştiye hejmara 100’ê. Ez bi hilkevta xizmetên berbiçav ên ‘Agirî’, destxweşî û mandînebûnê ji xebatkarên ‘Agirî’ dikim û hêvî dikim pênûsê xebatkar û hevkarên wê xurttir û belavoka me rengîntir bibe. Nivîsarên Agirî, pirrreng in û mijarên fikr û raman, siyasî, civakî û çand û huner tê de hatine cihkirin û belavkirin. Ewa ku hewce ye nivîskarên hêja yên ‘Agirî’ zêdetir bala xwe bidnê de, geşandin û pêşvebirina zimanê weşanê û di heman demê de, parastina resenatiya zimanê Kurdî ye.


Careke din bi vê hilkevta pîroz ve, detxweşiyê ji we dikim û hêviya min ev e ku nivîsarên ‘Agirî’ zengîn û balkîştir û duhetînameya we rengîngtir be.

www.oslakurdi.org



Barak Obama

# Peyama Rêzdar Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî Yê PDK Îranê Ji Bo Barak Obama Û Bersiva Wî



Mistefa Hicrî

**Rêzadr Barak Obama, Serokê Dewletên Yekbûyî Yên Amerîkayê**

Bi hinceta hilbijartina cenabê te weke 44´emîn Serok Komarê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, ji aliyê xwe û rêberiya partiya xwe ve anku PDK Îranê, pîrozbahiyên herî germ pêşkeşî we dikim.

PDKÎ pitir ji 60 salan e ku li dijî rejîmên dîktator ên Paşayetî û Komara Îslamî a Îranê, bi armanca dabînkirina mafên destpêkî ên netewa Kurd di çarçoveya welatê pirrnetewe yê Îranê de xebat kiriye û niha jî li ser domandina xebata xwe berdewam e.

Armanca me pêkanîna Îraneke demokratîk û federal e. Di pêxema vê daxwaziyê de xelkê me rastî tundtirîn tepeserkirin, girtin û daliqandinan hatiye.

Em hêvî dikin ku siyaset û bernameyên Amerîkayê li jêr dirûşma **guhertinê** alîkariyek baş be bona pêkanîna guhertinan di welatê me anku Îranê de. Welatek ku ketiye jêr destê yek ji rejîmên herî dîktator ên cîhanê.

**Partiya Demokrat A Kurdistana Îranê**
**Sekreterê Giştî**
**Mistefa Hicrî**
**8.11.2008**

## Bersiva Obama ji bu Mistefa Hicrî

**Birêz Partiya Demokrat A Kurdistana Îranê**


Ez sipasiyê dikim ji bo pêwedî û diyarkirina soz û piştevaniya we. Bi hezaran peyam li hundur û derveyî welatê Amerîkayê gihîştine destê min. Ez şanaziyê bi bawerîbexşîna xelkê Amerîkayê bi xwe û "Joe Biden" wekî Cîgirê Serokkomar dikim.

Hêvî dikim ku derfeta berbirûbûn û dîtina wan pirsgirêkan ku netewa me rastî wan hatine, ji me re pêk were. Di pirojeyek mezin de bona nûkirina Amerîkayê, ez çavnihêrê xebat û karkirinê tevî hemû xelkê Amerîkayê me bê liberçavgirtina wê yekê ku deng bi tu kesî dane. Tenê rêya pêkanîna guhertinan ku pirraniya xelkê Amerîkayê li benda wê ne, mifahwergirtin ji hêz û şiyana xelkê Amerîkayê ye. Lewra ez û "Joe Biden" hêvî dikin ku hûn jî çalakiyên xwe û baskirin ji siyaseta netewî di civaka xwe de bidomînin.

**Tevî rêz û hurmetan**
**"Barack Obama"**
**12.11.2008**

**Nahîd Husênî:**

## "Agirî Ew Sekoya Berfireh Bûye Ku Karî Ye Nivîskarên Kurd Di Nav Rûpelên Xwe De Bicivîne"



Nahîd Husênî, endama Komîteya Navendî a PDKÎ

Di destpêkê de ez pîrozbahiya derketina 100'mîn hejmara Agirî û herwiha hilbûna mûma şeşemîn slavegera destpêbûna wê belavoka hêja û bedew ji we dikim.

Bêguman Agirî gaveke bi bandor û micid di warê rojnamegeriya Kurdî de bûye û asoyeke ronak û geştir li benda wê ye.

Agirî ew sekoya berfireh bûye ku karî ye nivîskarên Kurd di nav rûpelên xwe de bicivîne û minberek be ji bo guhartina dîtin û nerînên micid û cuda. Ewa ku min bixwe dîtiye û seh pê kiriye, komek nivîskarên berçav û xwedî pêgeh û azmûn li her çar parçeyên Kurdistanê pê re hevkariyê dikin û ewa jî asta gursî û giraniya wê belavokê dide xuyakirin.

Têdîtinek min jî heye, hêvî dikim ku hûn girîngiyê bidin mezinkirina qebareya Agirî bona ku derfeta mîzanpajiyeke rind û baştir jê re pêk bihê, herwiha heke çê be rûpela yekem û dawiyê berdewam rengî çap bikin.

Hêviya serekvtinê ji bo Desteya Weşanê û hemû xebatkar û hevkarên Agirî dixwazim.

## Agirî, Bingeh Û Çavkaniyek Mezin Bona Nûkirin Û Parastina Devoka Kurmancî Li Rojhilatê Kurdistanê



**Azad Kurdî, Berpirsê Agirî**

Ji ber bindestketina gelê Kurd li çar parçeyan, ziman yek ji nasnameyên neteweya Kurd bûye ku herdem ketiye bin gef û projeyên tunekirina dijminên gemar ên Kurdan. Ji ber sedemên siyasî, mixabin heta niha jî di wan welatan de ku Kurdistan di navbera wan de hatiye parvekirin – helbet ji bilî Başûrê Kurdistanê ku niha zêdetirî 15 salan e azad bûye – zimanê Kurdî qedexe ye û berdewam di bin tehlûkeya jinavçûnê de bûye/ye. Dijminên Kurdan bi awayekî sîstematîk rê li ber pêşveçûn, xwendin û nivîsandin bi zimanê Kurdî girtine û pêvajoya fêrbûn û bikaranîna ziman bi xurtî asteng kirine.

Li Rojhilatê Kurdistanê, rewşa han gellek xuya û berçav e, xwendin û nivîsandin bi zimanê Kurdî qedexe ye û radyo, televîzyon, rojname, kovar bi awayekî azad û serbixwe nikarin zimanê Kurdî bi serbestî bikar bînin. Vê yekê rewşeke gellek xirab ji bo zimanê me yê neteweyî pêk aniye. Kesên ku li ser ziman dixebitin û dinivîsînin, berdewam rastî pirsgirêk, asteng, dijwarî û gefan tên.

Ji bo ku zimanê Kurdî winda nebe û beşek ji nasnameya Kurdan a neteweyî ji nav neçe, partiyên siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê bi giştî, nemaze PDKÎ weke pêşengê xebata neteweyî – demokratîk a gelê Kurd herdem bi rêya weşandina rojname, kovar û çapemeniyên din, radyo, vekirina dibistan, perwerdekirina mamsotayên fêrkar ên zimanê Kurdî, weşandina pirtûkên Kurdî û wd... girîngiyek taybet dayiye parastin û bikaranîna zimanê Kurdî. 11 meh desthilatdariya Komara Kurdistanê di sala 1945'an û çend mehên destpêka serkevtina şoreşa gelên Îranê di sala 1979'an ku PDKÎ di beşek ji Kurdistanê de desthilatdar bû, mînakên herî baş in bona selimandina vê rastiyê. Aliyê kêm di 30 salên borî de, valahiya weşaneke xwerû Kurmancî a azad ew jî bi tîpên latînî weke hewcehî û pêdiviyeke berçav dihate xuyakirin. Lerwa bi piştgirî û hevkariya PDKÎ, komek Pêşmergeyên welatparêz, şoreşger û ronakbîr ew berpirsiyariya girîng li stû girtin û bi vî awayî '**Agirî**' xebata rojnamegeriya vê weşanê di Çiriya Paşîn a sala 2003'an de dest pê kir û hejmara yekem a wê derket.

'**Agirî**' weke yekemîn weşana xwerû Kurmancî bi tîpên latînî li Rojhilatê Kurdistanê, gaveke pirr mezin û dîrokî bû ku komek ciwanên welatparêz û ronakbîr di nava PDKÎ ew xebat dest pê kirin û niha temenê vê yê bûye şeş salî û 100 hejmar jî. Agirî bingeh û çavkaniya herî baş a parastin, nûkirin û zindîkirina Devoka Kurmancî li Rojhilatê Kurdistaê ye, armancek mezin ku hêvî û xweziya avaker û rêveberên wê bû û bi kêfxweşî ve îro ji aliyê gelê Kurd li her çar parçeyan û her cihê cîhanê ku Kurd lê dijîn, nemaze jî li Rojhilatê Kurdistanê bi başî tê hezkirin û roj bi roj alîgir û xwendevan û hevkarên wê zêde dibin. Ya herî girîng eva ye ku nifşa nû a Kurdistana Îranê ji vê rêyê ve fêrî Kurmancî bibin û bikar bînin, ji ber ku tenê perwerde û xwendin û nivîsîn bi Farsî ye û zarok, ciwan û hemû tex û qatên civaka Kurdistana Îranê ji mafê sereke yê xwendin û nivîsîna azad bi Kurmancî bêpar in.

Bi vê hêviyê ku Agirî li ser axa azad û serbest a Rojhilatê Kurdistanê bihê çap û belavkirin û bi vê yekê armancên xwe yên sereke û girîng bi başî û yekcarî bişopîne...

www.arsivakurdi.org

**Nûredîn Sofîzade:**

## "Bila Agirî Aliyê Kêm Bibe Heftîname"

Berî her tiştê, ez belavbûna sedemîn hejmara belavoka Agirî ji we xebatkar û birêveberên wê pîroz dikim.



**Nûredîn Sofîzade, Rojnamevan**

Bêguman di encama xebat û tekoşîna we bûye ku kariye ev belavokê bigehîne qonaxa niha. Her aliyek ger xwediyê hinek xwestekan be, yan bixwaze teblîxê ji bo daxwazên xwe bike, yan bixwaze ji hizr û êş û daxwazên xwe agahdar bike û bixwaze bala xelkê bo aliyê xwe ve rabikişîne, divêt bi qasî ku ji dest tê û dikare ji hemû rêyan mifahê bistîne û ne tenê xelkê hevzimanê xwe, belku ger îmkan hebe, ol, netewe û zimanên din ji pirs û hizr û helwestên xwe têbigehîne.

Mixabin heya 6 salan berî niha PDK Îranê tenê bi devokek Kurdî anku Kurmanciya Jêrîn siyaseta xwe di ragihandinan de dikir, lê bi kêfxweşiyê ve piştî vê çendê ku seh bi vê kêmasiyê hate kirin ku ger partiya me dixwaze her 40 milyon Kurdan ji siyaset û dîtinên xwe û xebata xwe di Kurdistana Îranê de agahdar bike, divêt Kurmanciya jorîn jî berçav bigire.

Belavoka Agirî di encama hewcehiyek han de hate avakirin. Derheq van sed hejmarên belavbûyî yên Agirî, divêt were gotin ku bi kêfxweşî ve kariye gellek xizmetên berçav bike û bandorek baş hebe: 1. Agahdarkirina beşek zaf ji Kurdan derheq siyaset û dîtinên PDK Îranê, 2. Xizmet bi devoka Kurmancî, 3. Xizmet bi çanda Kurdî, 4. Xizmetkirin di warê rewşenbîrî de, 5. Zanyarîdan derheq dîroka neteweya Kurd

Rexneyek min heye, her belavok ku rojane belav nebe, rojname nîne.

Belavokên ku rojane belav dibin, jêre dibêjin rojname, bi raya min divêt navê rojnameya Agirî biguhere û bibe duheftîname. Ji ber ku her 15 rojan carekê belav dibe û li gor azîn û usûlên rojnamevaniyê, Agirî duheftîname ye.

Ez pêşniyar dikim, ger îmkan hebe Agirî bikin heftiyane û navê wê jî bila heftîname be. Her wiha nivîs girtir bên nivîsîn û rûpelên Agirî jî bên zêdekirin.

Hêviya serkevtinê ji we re dixwazim.

---

**Şerîf Felah:**

## "Hewce Ye Ku Agirî Zêdetir Pirsa Zimanê Standard Û Hevgirtî Yê Kurdî Bixe Ber Bas Û Nîqaşê"

Di destpêkê de, belavbûna 100'mîn hejmara weşana Agirî û destpêkirina şeşemîn salvegera wê, ji hemû hevalên xebatkar û birêveberên rojnamê û Komîsyona Çapemenî a PDK Îranê û malbata mezin a rojnameya Kurdî pîroz dikim.



**Şerîf Felah, Rojnamevan**

Di serdemê şerê ragihandin û zanyarî û cîhana pan û berfireh a pêwendî û ragihandinê de, rojnamevanî û pirsa nivîsînê girîngî û buhayek diyar û berçav heye, lewra hewce ye ku her kes û aliyek bona selimandina hebûna xwe tevlî cîhana ragihandinê be. Hewce ye ku hemû rojnameyên Kurdî tevî şirove û dahûrandina derbazbûyiya neteweya xwe, hewlê ji bo reform û guhartin û pêkanîna delîveya bona rexneyên bibandor û karîger bidin. Bi raya min ger Agirî di pêşerojê de pirs û xalên jêrîn li berçav bigire, dvê zêdetir gelîtir û îroyîtir bibe.

Pêşniyarên min ji bo Agirî ev in:

1. Girîngiyek zaf bide bi exlaq û pirensîpên rojnamevanî û rê û cihên navneteweyî ên rojnamegeriyê
2. Mijar û pirsên pêwendîdar bi Rojhilatê Kurdistanê zêdetir bixe berbas.
3. Guhartinê di çarçove, form, dîzayn, montaj û sayza Agirî de pêk bîne.
4. Girîngîdan bi çand û huner û kultûra neteweyî.
5. Pirsa zimanê Kurdî û bi taybetî zimanê hevgirtî yê Kurdî zêdetir bixe berbas û ger derfet hebe, kuncek taybet bi vê mijarê bê avakirin.
6. Şirovekirin û encamdana lêkolînan bi ser çand û wêjeya nenivîskî û her wiha girîngîdan bi wêjeya Kurdî.
7. Hewildan bona pêkanîna pirr navbera nivîskaran, zimannasan, hunermendan û rojnamevanên hemû beşên Kurdistanê.

---

## Şiroveya Peyvên Siyasî



**Berhevkar: Omîd Esxeran**
**omid_anbi@yahoo.com**

# ÎMPERYALÎZM

Têgiha Împeryalîzmê ji peyva "Imperiu" ku tê wateya Împeratorî û koloniyalxwaziyê, hatiye wergirtin. Metoda han a destdirêjîker di dawiya sedsala 19'an di cîhanê de dest pê bû û ji bo wan welatan bikar dihat ku li derveyî sînorê welatên xwe ji bo anîna çavkaniyên madî û mirovî ji welatên parvemayî ên Asiya, Afrîqa û Amrîkaya Başûr hewl didan.

Lenîn pênc xalên sereke ji bo pênaseya Împeryalîzmê destnîşan dike ku bi vî awayî ne:

1- Kombûna heyîn û berhemanînê dibe sedema çêbûna monopolan ku eva jî bixwe di jiyana aborî û sermayedariyê de, rolek bibandor dilîze

2- Bi serhildana sermayeyên bankî li cem sermayeyên pîşesazî, hin sermayeyên din ku di kultura siyasî de bi olîgareşî tê binavkirin, serî hildidin.

3- Li dewsa kala û berheman, lehiya sermayê rû ji welatan dike

4- Yekîtiyên sermayedarî ava dibin û yekîtiyên han ji curê Kartelan(yekîtiya sermayedaran ji bo ewlekirina nirxa berheman) û Tarstan(Yekîtiya sermayedarên berhemhêner) û Konsersiyom( Kompaniyayek mezintir ku ji çend kompaniyayên din ji bo dansûtandinên monopolî pêk hatiye) ku di warê aborî de cîhanê di nava xwe de parve dikin.

5- Di encam de, dawî bi dabeşkirina welatên cîhanê di nava sermayedaran de tê û piştî bidawîhatina parvekirina cîhanê di nava Împeryaliyan, şerê navbera wan de dest pê dike.

Împeryalîzm di welatên qels û bêhêz de ji bilî qadên siyasî û aborî, xwediyê tu armancek din nîn e û hewlê dide ku tim beşên aborî û siyasî bixe bin çavdêriya xwe û bi vî awayî hevrikiya azad a darayî û siyaseta navxweyî tevlîhev bike. Di zirûfa niha de, hewl ji bo bidestveanîna alavên xaw ên zêdetir û hêza kar a erzan û zalbûn bi ser kar û barên cîhanê de, bûye sedema pêkhatina dijheviyek tund di nava welatên împeryalîst de.

Împeryalîzm ji zalbûna siyasî û aborî a welatekê bi ser welatek din re tê gotin ku hin caran ji rêya leşkerî ve welatên han dagir dike û hin caran jî ji bo dabînkirina berjewendiyên siyasî û aborî ên xwe, hikûmeteke kirêgirtî di nava welatê dagirbûyî de ava dike.

Împeryalîzm di sedsala 19'an de, bi leşkerkêşiya hin welatên Ewropayî weke Birîtaniya, Fransa, Holanda, Beljîka, Portogal û Îspaniyayê ji bo dagirkirina welatên Asiya, Afrîqa û Amerîkaya Başûr dest pê kir û di sedsala 20'an de jî hin welatên weke Almaniya û Îtaliya û Japon jî hewla dagirkirina welatên din dan. Arîşe û pirsgirêkên han li dehsala 1880'an heya 1914'an, bi ser siyaseta navneteweyî de zal bûye, lewra serdemê han weke çaxê împeryalîzmê hatiye nasîn. Îro rojê têgiha Împeryalîzma Çandî jî derketiye holê ku ji bandora menewî û çandî a welatên împeryalîst ji rêya bikaranîna desthilata siyasî û aborî ji bo berfirehkirina deb, edet û buhayên kulturî ên xwe ji rêya çanda welatên din de, tê gotin.

**Çavkanî: (Ferhengî Ramiyarî Nîga) Azad Weledbegî**
**(Danêşnamêyê Siyasî) "Politicial Dictionary" Daryûş Aşorî**

www.arsivakurd.org

**Çinûr Qadirî:**

## "Ya Ji Bo Min Girîng Û Balkêş Ev E Ku Agirî Bi Tîpên Latînî Weşanê Dike"



**Çinûr Qadirî, Çalaka Mafê Jinan**

Di destpêkê de, şeşemîn salvegera Agirî û her weha 100'emîn hejmara rojnameya we bi dil û can pîroz dikim. Hêviya min serkevtin û berdewamiya Agirî di xebata wê ya hêja û pîroz de ye.

Li Rojhilatê Kurdistanê demeke dirêj bû ku rojname an çapemeniyek bi kurmancî û tîpên latînî ne dihate xuyakirin. Agirî ew valahî bi başî tejî kir. Bi raya min rola Agirî di vê derheqê de dîrokî û girîng bû. Ji bo zimanê Agirî gellek balkêş e, ji ber ku zimanê Agirî nêzîk standarda kurmancî ya Botanî ye. Her kes dikare jê fehm bike.

Bo min wek xwandevaneke Agirî eva girîng û balkêş e ku bê tîpîn latînî diweşe. Bi sed hejmarên weşandî, Agirî xizmetên mezin bi zimanê kurdî, çand û rojnamegeriya kurdî kiriye û di vê qadê de cihek baş girtî ye.

Ez pêşniyar dikim, li gor derfet û îmkanên xwe guhartinên pêwêst di Agirî de pêk bînin, aliyê kêm dema weşanê ji 15 rojan bibe heftiyê careke, rûpelên wê mezintir bibe, rûpelekê taybet bi jinan terxan bikin. Hêviya serkevtinê ji we re dixwazim.

---

**Sidîq Derwîşî:**

## "Agirî Karî Ye Devoka Kurmancî Zindî Rabigire"



**Sidîq Derwîşî, Endamê Komîteya Navendî Ya PDKÎ**

Bi hilkevta 100'emîn hejmara 'Agirî' û her wiha şeşemîn salvegera belavbûna weşana we, pîrozbahî, destxweşî û mandînebûnê dibêjim xebatkar û rêveberên 'Agirî'.

Bi raya min yek ji bingehên armancên xebata 'Agirî' ji raman û rêbaza neteweyî û demokratîk a PDKÎ çavkanî digire û weşana we di şopandian armancên xwe di warên siyasî, civakî, çandî û hunerî de serkevtî bûye. Ji ber ku Agirî ji bilî vê yekê ku armancên siyasî yên taybet bi xwe şopandiye, lê ji pirs û mijarên civakî, çandî û hunerî dûr nebûye û ew mijar bi berfirehî di rûpelên xwe de cih kiriye.

Bi raya min 'Agirî' herî zêde di nava çîn û qata rewşenbî, xwendekar, nivîskaran de cih girtiye û hezkerên xwe hebûye. Li Rojhilatê Kurdistanê xwendin û nivîsîn bi latînî qedexe ye û niha ciwan, nivîskar û rewşenbîr bi nepenî û bi awayekî veşartî zimanê Kurdî bikar tînin û eva bixwe bona xebata rojnamegeriya bi latînî astengek mezin e, dewleta Komara Îslamî rê nade ku zimanê Kurdî bi tîpên latînî were bikaranîn.

'Agirî' karî ye zaravê Kurmancî li Rojhilatê Kurdistanê zindî rabigre û di vî warê de pirr serekvtî bûye, lê hêj maye ku bi tevahî cihê tîpên erebî bigire, sedema wê jî ev e ku Agirî li derveyî Rojhilatê Kurdistanê diweşe.

Bi baweriya min 'Agirî' bi başî azîn û usûlê rojnamegeriyê berçav girtine û rêbaza wê ya neteweyî û demokratîk pirr xuya û eşkere ye. Roj bi roj zêdetir ber bi weşaneke profesyonel û pîşeyî gavan davêje û bona xizmetên xwe ciheke taybet di nava rojnamegeriya Kurdî de girtiye.

Ez pêşniyar dikim: 'Agirî' nebe paşkoya rojnameya KURDISTAN û mijar û nivîsarên wê wernegerînin, rengîntir be û qoncên zêdetir ên siyasî, çandî, wêjeyî, civakî û wd.. veke, rûpela wê mezintir bibe û herî zêde ji îdyom û biwêjên navçeyan mifahê bistîne.

---

# Temenek Kurt, Xizmetek Berbiçav



**Selîm Zencîrî, endamê Desteya Weşana Agirî**

Em di demekê de ber bi pêşwaziya hejmara 100'emîn ya Agirî ve diçin ku cîhan bûye gundek biçûk. Pêşketina lezgîn a zanist û teknolojiya, ragihandin û herweha dahênanên nû, karê pêwendî û haydarbûn ji rewş û jiyana mirovahiyê hêsantir kiriye. Di rastî de ragehandinê wekî desthilata çaremîn kariye rol û armanca bingehîn a xwe ku pêşdebinina mirovahiyê û misogerkirina azadî, yeksanî û dadperweriyê ye, bi başî bi cî bîne.

Rojnamevanî jî wek beşek girîng ji ragehandinê dîrokek dûr û dirêj, hêja û binirx ji xwe re tomar kiriye.

Di vê navberê de rojnamevaniya kurdî jî herçiqas li gorî demê hinekê derengtir maye, lê bi derçûna yekem hejmara "Kurdistan" di 22'ê Nîsana 1898'an de ji aliyê Miqdad Midhet Bedirxan ve xwe da eyanê. Paşan bi geştirbûna bizavên netewî û rizgarîxwazane, şoreş û serhildana rojnamevaniya kurdî jî geştir bû û em dibînin ku bi sedan kovar, rojname û belavokên din yên kurdî bi armanca lîstina rola bingehîn a xwe di pêşdebirina bîr û hizrên pêşketinxwazane, netewî, çandî û bi taybet parastina ziman de ev rêya dûr û bi zehmet serbarê astengî û polîtîkayên qedexekirin û helandinê ji aliyê dewletên dagirker ve dişopînin û karîne berdewam bimînin û li hember şûra dujmin de mertalekî qahîm bin.

Agirî jî yek ji wan rojnameyan e ku mafê jidayîkbûna bi azadî nebûye û nikare bi azadî jî bijît. Lê serbarê kêm îmkanatî û nebûna perwerdeyek profesyonal di wê temenê kurt yê xwe de kariye erk û rola niştimanî û rojnamevaniya xwe bi başî bi cî bîne û destketên baş bidest bixe, herweha di refa herî pêş a karwanê rojnamevaniya kurdî de cih bigre û bibe hêviyek mezin.

Agirî domkerê rêya "Hawar"ê ye, ew Hawara ku stêra geş a esmanê rojnamevaniya kurdî bû. Agirî bi derçûna yekem hejmara xwe qonaxek nû di dîroka rojnamevaniya kurdî di Kurdistana Îranê de dest pê kir, çunku piştî borîna çendîn dehsalan li ser derçûna "Kurd" ji aliyê Simkoyê Şikak ve, Agirî yekem rojname ye ku bi Kurmanciya Jorîn û girîngtir ji wê jî yekem rojname ye ku di Kurdistana Îranê de bi tîpên latînî tê weşandin. Di hinek hejmarên Kovara "Sirwe" de jî, nivîsên Kurmancî hatine şandin.

Agirî her di yekem hejmara xwe de welatparêzî, rewanbêjî, rastbêjî, parastin û geşandina ziman û xizmet di hemû warên jiyanê de kire bingeh û armanca karê xwe û di rastî de jî heya niha di gihandina peyama xwe û rola xwe de serkevtî bûye. Agirî karî ew valahiya dîrokî di rojnamevaniya kurdî- kurmancî li Rojhilatê Kurdistanê de heya qasekê tejî bike û bibe pirek qahîm di navbera parçên Kurdistanê, Kurdên Soviyeta berê, yên Ewropa û bi giştî hemû cîhanê bibe sefîrek baş ji bo nasandina doza rewa ya kurd, bûye kevokek aştîxwaz li ser esmanê kurdan û roj li pey rojê sînorê firîna xwe û peywendiyên xwe xurttir û berfirehtir dike.

Bê guman tu rojnameyek nikare hemû ew xewn û hêvî û xwastikên gel bi cî bîne û dûr be ji kêmasiyan, lewre pirr siroştî ye ku Agirî jî di vê çarçoveyê de cî bigre. Lê girîng ew e ku ji karwanê pêşketinê pare nemaye û tim di hewl û bizavê de ye û kariye di wê temenê kurt û kin yê xwe de xizmetek berbiçav bi çand, tore, ziman û alfabeya kurdî ya latînî bike û tim bi êş û janên gelê xwe re bijît û bi serkevtinên gelê xwe re şad û bi xem û nerihetiyên gel re jî xembar.

Lewre hewce dike ez jî wekî endamek desteya damezrêner yê weşana Agirî, derçûna hejmara 100'an ji xwe, desteya weşan û hemû xwendevan û xemxorên Agirî re pîroz bikim. Dibêjim bila hûn sax û silamet bin û emê hewlê bidin bi pişgîriya we hîna xizmetên baştir û serkevtinên bêhtir bidest bixin.

**Perî Îslamniya:**

## "Divê Agirî Zêdetir Girîngiyê Bide Pirsa Jinan"


Perî Îslamniya, Çalaka Mafê Jinan

Di destpêkê de ez dixwazim 6'mîn salvegera weşana Agirî li xebatkarên vê rojnamê pîroz bikim. Mandînebûnê dibêjime we rojnamevanên hêja û hêvîdar im ku herdem di kar û xebata xwe de serkevtî bin.

Rojnama Agirî, weşaneke siyasî, çandî û civakî ye û xwendevanên wê di her warekê de mifahê ji nivîsên ku di rojnamê de têne weşadin, werdigirin.

Di warê ziman de bi awayekî durust û rêkûpêk zaravê Kurmancî bi kar tînin û di warê çand û hunerê de jî xizmeteke mezin bi çanda kurdî dike.

weşana Agirî di warê rewşenbîriyê de bi gotar û belgên dirust raya xwendevanan bo aliyê xwe dikêşîne. Gellek babet û gotarên curbecur û zanistî li ser pirsên civakî û bi taybet pirsa jinan mirov dikare di nav Rojnama Agirî de bibîne. Û eva jî asta zaniyarî û hesta xabatkarên wê rûpelên nîşan dide. Ez weke jinekê hîvîdarim ku Rojnama Agirî zêdetir ji caran girîngiyê bide pirsa jinan li giştî Kurdistanê û nemaze li Rojhilatê Kurdistanê.

---

**Xosro Ebdullahî:**

## "Agirî Xizmeteke Mezin E Ji Bo Ziman Û Wêjeya Kurdî"


Xosro Ebdullahî Mamostayê Zaravê Kurmancî li Enistîtûya Ziman û Temmedunên Rojhilatê - Parîs

Hevalên Hêja yên Desteya Weşana Agirî

Digel silavên germ û rêzdariyeke bi rûmet ji bo têkoşîn û xebata we ya hêja !

Zaravê Kurmancî yekek ji dewlemendtirîn zaravên zimanê kurdî ye ku nêzîkî ji sedî heftêyê gelê me bi vî zaravî dipeyive. Yekemîn Rojnameya kurdî "Kurdistan" jî bi vî zaravî derketiye.

Şermezariyeke pirr giran bû ji bo partiyeke wekî Partiya Demokrata Kurdistana Îranê ku sedî hetêyê gelê kurd ji têgehîştina raman û siyaseta xwe bêpar bihêle. Mixabin, ta şeş salan berî niha, hinek berpirsên berçavteng (yên ku niha di PDKÎ'ê de nemane) nedihêlan ku bi vî zaravî tiştek bête weşandin. Lê berxwedan û bi taybetî amadebûna we hevalên hêja û dilsojî û piştgiriya beşekî berçav yê birêveberiya partiya me bû sebeb ku ne tenê ew astengî ji holê rabin, belkî beşekî girîng ji gelê me ji siyaset û helwêstên partiya me û her wisan jî ji rewş û xebat û têkoşîna gelê kurd di vî beşê Kurdistanê de agahdar bin. Her weha xizmeteke mezin e ji bo ziman û wêjeya kurdî. Bi rastî destê we neêşe û her li ser vê riya hêja û durust dom bikin !


Eger hûn bişên navên mehan yên kurmancî bi kar bînin dê hêj çêtir be.

Ez ji kûrahiya dil ji bo we bextewerî û ji bo xebat û xizmeta we ya hêja serkevtinê dixwazim!

---

**Rojeva Civakê**

## Agirî Giringiyeke Taybet Dide Pirsên Civakî


Hemîd Muxtarî, endamê Desteya Weşana Agirî

Rojnameya Agirî 6 salan berî niha û di encama hewcehî bi hebûna wê, ji aliyê PDK Îranê ve hate avakirin. Weşanek ku di destpêkê de mehê carekê dihat weşandin û piştî heyameke kurt bû 15 rojan carekê. Îro Agirî gihîştiye sedemîn hejmara xwe. Agirî di vê heyama 6 salan de kariye gellek ceribîn û ezmûnan di zaf warên rojnamevaniyê de bi dest bixe. Di kêleka beşa siyasî û çandî de, beşa civakî beşek sereke a xebata rojnameya Agirî bûye. Ez dixwazin di vê nivîsarê de bas ji girîngîdana Agirî li dor pirsgirikên civakî ên civaka Kurdistanê bi giştî û bi taybetî di Kurdistana Îranê de bikim. Rojnameya Agirî her di destpêka avabûna xwe de girîngiyek berçav daye beşa civakî. Di vê weşanê de herdem pirsên civakî hatine baskirin û mijar û lêkolînên dewlemend ji aliyê hevalên xebatkar ve hatine nivîsandin û di hejmarên cur bi cur ên rojnameya Agirî de hatine belavkirin û hewce ye ku em li vir û di vê derfetê de ku pêk hatiye, destxweşiyê ji hemû wan hevalan bikin ku di vê beşê de hevkariya rojnameya Agirî kirine.


Heke em balê bidin rûpelên Agirî, mijarên beşa civakî ku di rûpelên 7 û 8 de hatiye/tê weşandin, tevî mijarên cur bi cur ên civakî weke pirsgirêkên zarokan û ciwanên civaka me, pirsên jinên Kurd di her çar beşên Kurdistanê de û nemaze di Rojhilata Kurdistanê de, pirsên weke bengdarî, berdan, HIV, helatina mêjiyan, kuştinên namûsî di Kurdistanê de, xebat û astengên li hember mamosta, xwendekar, karkeran di Îran û Kurdistanê de, jiyana tejî êş, azar û dijwrî a xelkê bê dahat yê Kurdistanê, girtin, îşkencekirina xwedekaran, jinan, azadîxwazan, xizanî û hejariya xelkê Kurd, nexwendewariya civakê û gellek rapor û serhejmariyên nû di vê derheqê de berbirû dibin ku cihê destxweşî û pêzanînê ye. Armanca rojnameya Agirî bi danîna beşa civakî eva bû ku hem xelkê ji hebûna wan diyardeyan agahdar bike û bi baskirina sedem û encamên hebûn û xurtbûna fenomenên han, xelkê zêdetir hişyar bike û bikaribe di pêşvebirina civakê li gor ast şiyana xwe xizmetê bike.

Çimku Agirî jî weke pirraniya weşanên din ên cîhanê ev yek kiriye rêbaza xwe ku ragihandin dikare di pêşxistina civakê de bibe xwedî rolek pozetîv û bi hişyarkirina xelkê, pêşî ji xurtbûna diyardeyên bi xeter ên han bo ser civakê bigire. Yanî di rastî de ragihandin dikare rola pêşengbûnê bilîze. Xebata Agirî di vê derheqê de bandor hebûye û bi berdewambûna xwe bandora xwe jî zêdetir dike. Em hêvî dikin ku gişt mirovên wekhevîxwaz û berpirs heya ew qasî ku dikarin di pêşxistina civaka me a kurdewarî de me re bibin hevkar û bi şandina mijar û raporên xwe di dewlemendkirina rojnameya xwe anku Agirî de hevkariya me bikin.

www.agiri.org

**Konê Reş:**

# "Ji Binxetê Em 100'mîn Hejmara Rojnameya Agirî Pîroz Dikin"



**Konê Reş**
**Nivîskar**

Ez jî kêfxweş dibim ku dewla xwe di nav ava bîra rojnameya **Agirî** de dakim û hin ji bîr û baweriyên xwe bo derçûna hejmara 100'mîn bînim ziman. Di destpêkê de tev rêvebirên wê pîroz dikim, di serê wan de mamoste **Mistefa Hicrî** Sekreterê Giştî yê PDK Îranê, yê ku ji berî şeş salan ve, partiya wî ev biryara dîrokî standiye bi weşandina vê rojnameya ciwan û bedew, bi kurdiya latînî. Ez ji dil û can spasiyên xwe jêre pêşkêş dikim.

Ji dor du salan ve ez vê rojnameyê dişopînim û kêfa min jêre hatiye, ew jî ji ber gellek sedeman:

1 – Bi kurdiya me ye; latînî û Kurmanciya me ye. Em xweş di babet û naveroka wê de digihêjin. Ev yek sebaretî min gellekî giring e. Nexasim divê tevliheviya ku şêweyê soranî hin bi hin li Kurdistana me a azad dibe standerd û şêweyê me bi paş de vedigere. Ji ber ku di van herdu salên dawîn de, li dor standardkirina zimanê kurdî gellek guftugo hatine lidarxistin û hin hewildan hene ku zimanê kurdî li başûr bibe Soranî û hin bi hin Kurmancî pûç bibe. Bi behana ku Soranî xwedî dîrok û cî girtiye û Kurmancî nikare wî cihî dagire. Lê rojnameya Agirî xweş bersiv e ji wan kesan re, ewên mîna Ferhad Şakelî û Muhsin Ciwamer ku bi zikreşî şerê şêweyê Kurmanciya bakur dikin û hewil didin ku zarokên Zaxo û Duhokê ji avê re bibêjin Aw û ji jinê re bibêjin afret.. Mixabin.

2 – Ez ne konevan im di warê siyasî de, lê ez xweş serwextî dîroka Kurdistana Rojhilat im, ji şêx Ubêdellahê Nehrî, Simko Axayê Şikakî, Pêşewa Qazî Mihemed û herdu şehîdên nemir Dr. Qasimlo û Dr. Şerefkendî ku ev rojname nav û dengê wan bilind dike. Ez jî ji dil spasiya vê partiyê dikim.

3 – Îro roj, ji me kurdan tê xwestin ku em ziman û ferhenga xwe biparêzin û bi zimanê xwe di nav miletên cîhanê de xwe bidin naskirin. Erê. Lê li gorî ku min rojnameya Agirî şopandiye, ez dibînim ku pirraniya babetên wê siyasî ne, ez nabêjim ku ferhengî û wêjeyî têde nin e. Lê di baweriya min de kêm in. Xwezî jî ji wilo zêdetir bana. Tevî ku bi gotarên Kek Besam Mistefa, Adar Jiyan, Omîd Eserxan, Hemîd Muxtarî û Ebdullah Hicabî, van biraderên ezîz tê xemilandin, gotarên wan xweş û bedew in, bi rêya wan em serwextî gellek tiştên balkêş dibin, lê xwezî em ji rêya Agirî re bêtir serwextî çand û wêjeya Kurdistana Rojhilat bibin.

4 - Bêguman zimanê Agirî gellekî xweş e û gerek bibe zimanê standard ji tev kurdan re. Wek rojname; Agirî rojnameyeke di terzê rojnameyên dewletên pêşketî de ye, bi nûçe û babetên xwe dewlemend e, li gor demê ye. Û wek ku kurdan gotiye: Goşt bê hestî nine.

Belê dawî ez dikarim bibêjim ku bi vê gava dîrokî re xewnên Mîr Miqdad Bedirxan, Mîr Celadet Bedirxan, Cegerxwîn, Mûsa Anter, Adip Karahan û Huseyin Deniz bûn rastî... Hem jî xewnên me bûn rastî. Em jî ji dil û can ji vê gava dîrokî re dilîlînin û şabaş dikin...Û pêre kurmanciya me bi me şêrîntir dibe.

Pîroz be gelê kurd li we derçûna hejmara 100'mîn a Agirî. Mijde bo we şehîdên peyva kurdî a resen, va zarokên we xwe ji dûv doza we a pîroz nedane alî, xewnên we dikin rastî.

**Letîf Epozdemir:**

# "Agirî Xwe Ji Bo Pêşerojê Amade Dike"



**Letîf Epozdemîr**
**Nivîskar**

Rojnama **Agirî**, bi rastî jî, karekî gellek giranbiha dike. Digel hişyarkirin û ronahîkirina gelê me yê **Rojhilatê Kûrdistanê**, her weha, di warê çand û huner û **Edebiyata Kurdî** a seranser de jî, xebatek bijare li berçav didomîne. Ez wekî welatperwerek sedem van xasyetên **AGIRÎ** bi dilgermî pîroz dikim. Ji aliyê dinê ve jî, ev rojname hesteke giring hilgirtiye. Di axa me ya **Başûr û Rojhilat** de ku **Alfabeya Aramî** bi kar tê; rojname, jiyana xwe ya weşanê sipartiye tîpên latînî û bi dil û can **Alfabeya Latînî** bi kar tîne ku çare nine wê **Edebiyata Kurdî** rojek vegere ser vê **Alfabeyê. Agirî,** vê yekê dibîne û xwe ji bo rojên ayende amade dike. Dûrbîniya rojnameyê jî, hêjayê pesindariyê ye. Helbete rêveber û xebatkarên rojnameyê, lazim e em bi dil û can pîroz bikin ku eva 6 sal û 100 hejmar in, bê westan û rawestan rojnameyê, têkûz hetanî îro anîne. Bi rastî ez wan gellek serkevtî dibînim û bi rêz digrim. Ez jî, hinek caran bi nivîs û gotaran arîkarî û yarmetiya **Agirî** dikim û lewra xwe şanaz û kûbar dihesibînim. Hewce ye ku bêjim, ev arîkariya min dê, di rojên ayende de jî, berdewam be. Di gel silavên germ û dilînî, hêvîdar im ku her tim serkevtî bin, her şad û bextewer bin.

*Kaniya Helbestan*

# Helbesta Baranê



**Nahîd Husênî**

Evarekê
rişêşkek baranê
helbesteke min î
dilter revand
sînor neman û min
neqetandin
erd nema û min
lê venenerî
ne min helbest dît
ne awran jî
navnîşana baranê
da min
gava min li dergehê dilê te da
helbesteke avzê ya evînê
çavê xwe yên xumarî
hilda
Çawa te nezanî
helbest û baran
aşiq û maşûq in
ji mêj de.

## Çav Hingivînî

Çav hingivînî
bes bi awirên çav
dilê min birevînî
û bi gotinên xweş
giyanê min!
Ez qeşake kevnare me
hindek maye
li ber tîşka evîna te
di himêza te de
bibihujim
û di derûna te de
bibim lehî.

www.arsivakurd.org

**Bêrî Bihar:**

## "Ez Li Agirî De Çar Parçeyên Kurdistanê Dibînim"


Bêrî Bihar, Helbestvan û Nivîskar

1- Min rojnama Agirî berî çend salan bi riya înternetê nas kiriye.

Ew roj û ev roj Rojnama Agirî ji min re bûye neynikek ku ez tenê bi her awayî ne perçeyek, lê çar perçeyên welatê xwe tê de dibînim. Bi saya Rojnama Agirî, heman bûyerên siyasî, aborî ku li Başûr, Bakûr, Rojhilat diqewimin bi germahî dişopînim.

2- Di rûpelên derheqê jin û jiyan de; Zext û zagonên, siyasî, olî û civakî wanên bêrûmet û genî ku hîn li Kurdistan diqewimin û qurbanên wan jî her tim jin in. Her wuha rewşa jinan li cîhanê ji beşên ku herî zêde jê dixwînim û dişopînim.

3- Di beşa hevpeyvînê de her hejmarê keseke/î, nivîskar, hunermend, muzîkvan bi me dide nasandin. Her wiha em kesên ku bi çand û hunera Kurdî ve mijûl in nas dikin. Nûçeyên çand û huner bi têrî diweşîne.

4- Aliyekî rojnamê ya herî xweşik ku tu cudahî naxe nava perçeyên Kurdistanê û weke Kurdistaneke azad ji her beşan nûçeyan bêalî diweşîne.

Ew her çiqas weşana saziyeke siyasî ya Kurdan be jî, ew rojnama Kurdistana serbixwe ye.

-Ez weke nivîskareke Kurd ku ji cih û warê xwe dûr ketime, bi saya Rojnama Agirî bêrî, hizkirin, hest û ramanên xwe yên kurdewarî her carê ji nû ve dijîm.

Agirî her carê bêriya me ya welat hindek be jî kêm dike. Ez dixwazim ku Rojnama Agirî her û her bijî...

---

**Ebdulrehman Bamernî:**

## "Xebata Agirî Dê Bidome"

Wekî xwendevanekî berdewam yê rojnameya Agirî ku bi rêya malperê ve ez hemû hejmarên vê dixwînim û weke nêrînekî rojnamegeriyê dibêjim ku Agirî dê bikare di xebata xwe de berdewam be, ji ber ku dikare xwe bicî bike û belgeya wê jî ew e ku berdewam xwendevanên xwe hene. Derketina bêrawestan ya Agirî ku niha dê hejmara 100'ê derkeve, nîşana serkevtîbûna wê ye û ew jî vedigere bo xebata desteya rêveber û sernivîskarê wê rojnameyê.


Ebdulrehman Bamernî, Sernivîskarê Duheftînameya Çavdêr li Duhokê

Ez wekî xwendevanekî rojnameya Agirî li devera Badînan û bajarê Duhokê pêşniyar dikim ku hûn çend hejmarên vê rojnameyê li vê deverê belav bikin, ji ber ku ez bawer im ku xwendevanên Agirî li Duhokê zaf in û kesên ku pitir li tîpên latînî şareza ne, li devera Badînan in. Hêviya serkevtinê ji bo we dikim û sersala rojnameya me hemûyan (Agirî) pîroz be û derketina wê berdewam be.

---

## Bandora Agirî Di Bizava Neteweyî De

Weşana Rojnameya Agirî weke gavekî dîrokî û bibandor di tevgera ragihandin û rojnamegeriya Kurdî di Rojhilatê Kurdistanê de di heyamê temenê xwe yê kurt lê tejî berhem de kariye roleke gellek girîng û bibandor di pêvajoya bizava rizgarîxwazane a neteweya Kurd bi giştî û bi taybetî di Rojhilatê Kurdistanê de bilîze. Agirî bi şirovekirina aliyên cur bi cur ên jiyana siyasî, civakî, çandî û kultûrî a xelkê Kurdistanê û her wiha şirovekirin û eşkerekirina siyasetên qirêj û dijîmirovî yên rejîmên dîktator û dagîrker yên Kurdistanê, kariye bibe cihê hêvî û hezkirina her Kurdekî azadîxwaz û rewşenbîr.


Dara Natiq, endamê Desteya Weşana Agirî

Agirî mîna yekemîn rojnameya Kurdî bi devoka Kurmanciya Jorîn û bi tîpên Latînî li Rojhilatê Kurdistanê ku 6 salan berî niha ji aliyê PDK Îranê ve hate avakirin, serbarê xizmetkirin bi pêşxistina çand û wêjeya Kurdî, karî rolekî gellek girîng di komkirina nivîskar û rewşenbîrên gelê me bi giştî bilîze. Dema mirov mêzeyî rûpelên zengîn û têrnaverokên rojnameya Agirî dike, gellek nivîskar, rewşenbîr, helbestvan û siyasetvanên gelê me li Bakûr, Başûr, Rojhilat û Rojavayê Kurdistanê tên xuyakirin ku nêrîn û dîtinên xwe bi awayekî zanistî û dîrokî anîne ziman. Ew jî berfirehbûna xebat û tekoşîna Agirî dide xuyakirin.

Agirî, herdem hewil daye ku bi berhevdan û şirovekirina doza Kurd li çarparçên Kurdistanê û piştevanîkirin ji xebata rizgarîxwazane a neteweya Kurd û her wiha şermezarkirina siyaseta tepeserkirin û jiholêrakirina gelê Kurd ji aliyê hukûmetên dagîrker û hakim bi ser Kurdistanê de, erkê neteweyî û şorişvaniya xwe bi cih bigihîne.

Di rastî de mirov dikare bibêje ku Agirî pirek bûye bona zêdetir nasandina xebata mafxwazane û azadîxwazane a PDK Îranê ji bo neteweya Kurd di perçeyên din yê Kurdistanê û her wiha lihevgirêdana pêvajoya xebata rizgarîxwazane a gelê Kurd bi giştî.

Şirovekirina aliyên cur bi cur ên xebat û tekoşîna gelê me li Rojhilata Kurdistanê, berhevdan û nirxandina siyasetên çewt û dijîmirovî yên rejîma dîktator û kevneperest a Komara Îslamî a Îranê baskirin ji girtin, zîndanîkirin û îşkencekirina keç û xortên azadîxwaz ên welatê me, tepeserkirin û asimîlekirina neteweyên bindest yên Îranê, binpêkirina mafê mirovan li Îranê, dijwarbûna jiyana civakî a xelkê welatê me, mîlîtarîzekirina Kurdistanê û guhnedana Komara Îslamî bi tev yasa û zagonên navneteweyî û ... hemû ewane ji pirsên herî girîng yên welatê me bûn ku rojnameya Agirî bi xebat û tekoşînên berdewam a xwe di heyamê wan 6 salên derbazbûyî de xelk ji wan haydar kiriye.

Bi baldan bi aliyên cur bi cur ên xebata Agirî û nirxandina 6 sal temenê tejî heybeta vê rojnameyê, tê xuyakirin ku Agirî rolekî gellek girîng û erênî di pêvajoya xebata neteweyî a Kurd de lîstiye, ew jî cihê pesn û destxweşiyê ji xebatkarên rojnameya Agirî ye.

www.arsivakurd.org

**Evîn Çîçek:**

# "Rêvebirên Rojnamê Xwe Li Parçeyên Din Dûr Nagirin"

Hevalên Hêja!

Ez kesên ku di riya azadiya netewa xwe de can dane, bi rêz bibîrtînim. Yên ku zindî ne wî karî dom dikin jî kesên canfeda ne.

Pêwîst e meriv li gora zanistiya sosyolojîk-polîtîk şîrovan bike. Min hejmara 53'an heta hejmara 98'an a Agirî ber çavan de borand. Klassîfîkasyon girt ber çavan. Ew mijar hatine nivîsandin, şîrovekirin;

1-Dîroka tekoşîna PDKÎ û gotinên serokatiya partiyê û Sekreterê Giştî.

2- Polîtîka karên navxwe, polîtîka dîplomasiya partiyên din.

3-Şehîdên Kurdistanê, miradên-mayiyên wan.

3-Polîtîka, nêzîkbûna partiyê li ser hêzên Pêşmergeyên Kurdistanê, tekoşîn, formasyona Kadroyên siyasî, leşkerî.

4- Polîtîka li ser tekoşîn, pirsgirêk problemên me xatûn-xanimên Kurdistanî.



Evîn Çîçek
Helbestvan

5- Polîtîka li ser tenduristiya gelê Kurdistanê.

6- Polîtîka li ser xweza û ekolojiya Kurdistanê.

7- Polîtîka li ser rêxistinên gencan-ciwanan

8- Polîtîka li ser mafê mirovan.

9- Polîtîka li ser çand, huner, ziman, zanistî.

10- Polîtîka li ser tekoşîna partiyên Kurdistana Başûr, Bakûr, Rojava, Rojhilat.

Daxuyaniyên rêvebirên partiyê bi zelalî hatine nivîsandin. Xwestin, armanc tên fêmkirin. Eşkere tê dîtin ku rêvebirên PDKÎ li armancên tekoşerên berê dûr neketine. Di hejmara 60 de osiya Qazî Mihemed bang û bangawazî ye. Agahdarkirina milletê kurmanc li vê osê-xwestinên dawiyê xizmetek mezin e.

Rêvebirên rojnamê xwe li parçeyên din dûr nagirin, biyanî hîs nakin. Di demên pêwîst de helwestê digirin. Rojname xizmeta nêzîkbûna, hevîdî naskirina kurmancên derveyî welat-sirgûnê û yên parçeyên din dike. Ev; xizmeta yekkirin û yêkbûnê ye.

Cudabûnek din; rêvebir li welat in. Li gelê xwe dûr nasekinin. xebatkar, rêvebir hemû bi hev re çanda netewî diparêzin. Ne tenê bi dengkirinê-xeberdayînê, belku di pratîkê de, di jiyana rojane de bi kincên-cillên kurdan in. Parastvan in. Ew helwest cudabûna rêvebirên medya rojhilat û yên parçeyê Kurdistana Bakur dide ber çavên millet, nemaze kurmancan.

Ziman; Bi zimanê netewa xwe deng dikin-diaxivin-xeber didin. Ne bi zimanê dagirkeran. Rojname kurmancî ye. Nirxên milletê me diparêze. Sûretên netewî, hestên netewî xwedî dikin. Xwe bawerî, xwe hezkirin bilind dibe.

Xatûnên-xanimên kurmanc bi pirsgirekên xwe ve yek nav rûpelan da dibirqên. Di civata bindest de hezaran tengasî, pirsgirêk hene. Pirsgirêk tên eşkerekirin. Pêwîst e rêvebiriya rojnamê bi zanebûn, bi xwastin pirsgirêkan bide lêkolînkirin, eşkerekirin. Li gora encamê jî çareserî werin tespîtkirin. Rojname jî weku dibistanek karê perwerdê bidomîne, bîne şûnê.

Olên yek Xwedêyî civata me perîşan kirin. Di aşitiya nav malan de winda bû. Jin-ol-dîn ku bê tirs hatin nivîsandin, sebeb û encam hatin dîtin, mijar tê dengkirin, xeberdayîn. Heta ku bi zanîn nehê nivîsandin, şîrovekirin xwastina xelasbûnê, azadiyan weku utopiya dimîne.

Zarik; Tendurîstî, perwerde, ewlekariya zarikên me di xeterê de ye. Di Rojnamevan di nav milet de bigerin, bipirsin, dîtînan bidin hev. Rêvebiriya rojnamê jî bê sansur û qedexekirin her tiştî binivîsîne.

Kesên siyasî-polîtîk jî li gora şertên rojane, salên ber me jî bigirin ber çavên xwe û projeyan amade bikin.

Di rojnamê de programên tunnekirina, li xwe dûrkirina-asîmîlasyona dagirkeran werin eşkerekirin.

Zarok ji aliyê psîkolojîk û fîzîkî ve werin parastin. Rojname li gora mijaran şûnê bide pisporan, li dê-bavan bide fêmkirin.

Têkiliya Agirî û kurmancan; hin kesên ku di jiyana xwe ya taybetî de rêz û hurmetê heq nakin, bi rastî welatparêz ninin, xwe weku kesên çandê, canfeda nîşan didin. Di rojnamê de carnan bi kesên wer re hevpeyvîn tên çêkirin. Yan jî hin gotinên wan di beşa çandê de û yên din de tên nivîsandin, cî digirin.

Pêşniyara min ew e; rind û baş bipirsin, lêkolîn bikin. Qîmetê nedin her kesî. Nivîsandin û berpirsiyarî bi hev re dimeşin. Dema em kesên nerast-dirust di rûpelan de bicîh bikin, mafê dengkirinê û xeberdayînê bidin wan, millet jî wan kesen bi rastiyên wan nas nake.

Hin kes dinivîsînin. Di nivîsandinê de armanc fêmkirin e, yan na? Kî dayîna fêmkirinê bî pêwîst e bi zimanê gel were nivîsandin. Millet fêm bike. Di her malê de ferheng û dîksiyoner tune ye.

Agirî; têkiliyên Kurdan-Kurmancan derveyî welat, dîplomasî, çand, bîranînan, çalekiyên mafê mirovan baş dide naskirin.

**Dengê Rojava**

# Nêçîra Kewan!



**Besam Mistefa**

Dibêjin di serdema mandata Fransayê li ser Sûriyê, kurdekî ji Efrînê kewekî weke diyarî dide efserekî firansiz. Efser dema kewê dibîne, aqil di serî de namîne, hema radihêje demançeya xwe û du sê gulleyan di serê wî de berdide û ji yê Kurd re dibêje: ez diyariya te qebûl nakim, ji ber ku kew sembola xayintiyê ye!

Bê guman, mirov gellek taybetmeniyên xwe ji xweza, erdnîgarî û ba û hewaya xwe digire. Ne hewce ye bêjin ku xelkên deştê ne wek xelkên çiyê ne, her weha gund ji bajaran cuda ne, cihên germ ji yên sar…hwd. Ev yeka li ser gel û milletan jî rast tê.

Xwezaya Kurdistanê bi gellek curên teyrik û lawiran dagirtî ye, yên kedî û kovî. Lê belê ji hemûyan bêtir kew hene. Weke di çîrokên lawiran de jî diyar dibe, her mirovek û her lawirek û teyrikek xwedî hin taybetmendiyan e. Ne ser xêrê, kew bi dijmintiya hevalê xwe têne naskirin. Kewgîr dema diçin nêçîra kewan, kewekî li ciyekî datînin, û ew kew–yê girtî û qeydkirî!-hevalên xwe yeko yeko dixe xefikê de, ji kewgîran re dike nêçîr!


Pirsa bêtifaqiya kurda ji berê de hatiye destnîşankirin, nexasime ji aliyê nemir Ehmedê Xanî ve. Qet nabêjim ku kew sembola milletê kurd de, ji ber ku di nav her milletekî de kesên cur bi cur peyda dibin, baş û xirab! Lêbelê her gelek jî bi hin tiştan tê naskirin. Dikarim li vir bêjim ku vî teyrikî bi dirêjahiya salan hêlîna xwe di dilê gellekan ji me de çêkiriye! Ji xwe ez bi acizbûn vê yekê dibêjim…ji ber ku kurd im, lê gotineke "Gorky" tê bîra min dema dibêje divê ku em hemû xirabî û kêmasiyên civaka xwe aşkere bikin-heta yên here xerab-da ku em bikaribin wan ji holê rakin.

Heta niha em ji ereb û tirk û farisan re dikin xulamî, ji ber ku tifaqa me nîne. Hêjî em nizanin-yan jî naxwazin zanibin ku em bi hev hene, em bi hevdu mezin dibin. Tifaqî bingeha her serkeftinekê ye. Ez ne hatime şîretan li we bikim, ne jî serê we têşînim, tenê dibêjim, biryara xwe bidin û li pey min werin, em pêkve herin kewên xwe bikujin!

www.arsivakurd.org

**Mihemed Hemo:**

## "Agirî Dîwarên Di Nav Kurdan De Herifandin"



**Mihemed Hemo nivîskar**

Bi baweriya min rojnameya Agirî dîwarên di nav kurdan de herifandin. Îro bi xêra wê rojnameyê, siyaset û helwestên Partiya Demkrat ya Kurdistana Îranê bi temamî li Kurdistana Bakur, Rojava û di nav Kurdên Ewropa de tê xwendin û naskirin. Çunkî kurmancên hemû cîhanê îro ji riya vê rojnameya bi qedir re zanyariyan bi zarav û A B C ya xwe ji serê kaniyê bidest dixin, û bi xêra Agirî roj ji rojê kurmanc doza gelê kurd li Rojhilatê Kurdistanê pirtir dinasin. Bi rastî jî Partiya Demkrata Kurdistana Îranê, îro ji nêzîk ve li wan perçên din yên Kurdistanê jî tê naskirin. Ew jî bi keda rojnameya Agirî ye. Min nizanîbû ku hinde xwandevanên Agirî hene, ji berî du salan kurteçêrokek min di rojnameya Agirî de belav bûbû, gellek kes bi riya telefona yan bi riya Emailê ji min pirs dikirin, çi ew yên li welat in çi ew yên li Awropa ne, ji wê rojê de min zanî ku ev rojnama bi riya înternetê jî gellek tê xwendin.

Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê, Ddanerê Komara Kurdistanê ye û mîras û kultûrê komareke Kurd e, divê hemû kurd wê partiyê ji nêzîk ve binasin. Rojnama Agirî pirojeyek mezin e ji bo danasîna doza gelê kurd li Rojhilatê Kurdistanê.

Sed pîrozbayî ji bo Rojnameya Agirî bona sed hejmariya wê û salvegera wê ya şeşê.

Cara pêşîn rojnameya Agirî ket destê min, ez pirr pê şa bûm. Weha ez pê hest bûm ku Pêşewayê nemir, Pêxmberê welatperwer û dilsozê gelê Kurd Qazî Mihemed, carek din li soza xwe xwedî bi derket. Niha jî ku rol û girîngiya Rojnameya Agirî dibînim.

**Dilşa Yûsif:**

## "Tiştê Ku Herî Zêdetir Bala Min Kişand Di Rojnama Agirî De, Zimanê Wê Yê Zelal Û Pak E"



**Dilşa Yûsif**
**Hozanvan û Nivîskar**

Silav Agirî

Di serî de ez destxweşiyek germ ji ew kesên ku binçîna rojnama Agirî ya bi nirx danîn dikim, her weha destxweşiyê li wan hevalên birêz yên ku niha di rojnamê de kar dikin dikim. Û salvegera nû ya Agirî ji dil pîroz dikim. Rojnama Agirî di salvegerek nû de, her diçe bi şewiqtir dibe û cihê xwe di nava asmana rojnamegeriya kurdî de, wek stêrek diyar digre.

Tiştê ku herî zêdetir bala min kişand di rojnama Agirî de, zimanê wê yê zelal û pak e. Bi rastî ez hîna jî heyranê vê yekê me û gellek mereq dikim, ka çawa kesên me yên Rojhilata Kurdistanê ev zimanê zelal û yê ku giraniya kurmancan tê dighên ji xwe re zeft kiriye. Bi rastî vê yekê min da ramankirinê û dilê min gellek pê xweş e.

Ya din rojnama Agirî her gav deriyekî vekiriye, beramber her kurdekî qelemhez, û bê cudahî wan himêz dike, û eva çavkaniya xwe ji giyan û hizreke netewî yê berfireh digre, ku sînorên destkird di nava çand û nasnama kurdî de hildiweşîne. Û ev taybetmendî bes e ku xebata vê rojnamê bi armancê bighîne. Yanî bi kurtî rojnama Agirî sererayî hemû şert û mercên zehmet û dûrbûnê ji xaka xwe ya resen, armancên xwe yên sereke pêk aniye.

Dubare destxweşiyê li hemû xebatkarên Rojnama Agirî dikim, bi hêviya ku hîna zêdetir gula hilberîna rojnama Agirî geştir bibe, di gel rêz û silavan.

**Tahir Silêman:**

## "Li Asyasa Navîn Ji Agirî Pirr Hez Dikin"



**Tahir Silêman, Serniviskarê rojnameya Dîplomat li Azerbaycanê**

Pîrozbahîya germ û gor, ji alîyê Kurdên Azerbaycanê!

Silav û rêzên biratiya rojnama "Dîplomat"ê ji bo "Agirî", me ji rûpêlên we yên dewlemend, rengbirengî pirr nivîsarên dîrokî, çandî, hunerî, bûyerên rojê, yên Kurdistanê û cîhanê, kar û xebatên lêkolînên ser nivîskar, helbestvan û siyasetmedaran xwand. Lewra me xwand, çunku rojnama "Agirî" bi devoka kurmancî û kurdîtiya edebî a zelal û şirîn tê weşandin. "Agirî" rûpelên te wek gulên çîyayên Kurdistanê reng bi rengîn e, ji her rûpelekî te rengê gulên welatê me yê şirîn, ji her rûpelên te bîna çîyayê Kurdistanê tê. Bila rojnama "Agirî" wek çiyayê Agirî çawa serê wê digehîne erş û esmanan, wusa jî dengê rojnama "Agirî" bighêje erd û esmanên xaka Kurdistan û cîhanê.

Em pirr şane ku îro şeşemîn salvegera weşandina te ye û hejmara te ya SEDEMÎN ronahî dibînin. Ev bûyera xwaşik bona me û hemû xwandevanan cihê şahî, kêfxwaşî û serbilindiyê ye. Em ji Xwedayê mezin hêvî dikin ku ew roj bê, em bi we re di Kurdistanek yekbûyî û azad de, hejmara hezaremîn a "AGIRÎ" pîroz bikin.

Em xebatkarên rojnama "Dîplomat"ê bi vê hincetê pîrozbahiyê ji we rêvebir, nivîskar, rojnamevan, xebatkar û karmendên rojnameya "AGIRÎ", her wiha serkevtina we ji Xwedayê mezin dixwazin. Bi hurmet û rêz

**Tahin Silêman**, xwedan îmtîyaz û sernivîsarê rojnameya "Dîplomat" ê û **Egîr Çerkez** rojnamevan û nivîskarê kurd.

**Siyamend Terbî:**

## "Xebata Agirî, Di Biyava Ziman, Çand Û Rojnamevaniyê De Pirr Hêja Bûye"



**Siyamend Terbî**
**Rojnamevan**

Di destpêkê de ez şeşemîn salvegera weşana Agirî û derçûna 100'mîn hejmara wê ji desteya birêveber û malbata Agirî pîroz dikim. Hêvîdarim bi xebat û tekoşîna malbata Agirî, ew weşane roj bi rojê pêşveçûnên zaftir bi xwe ve bibîne. Bi raya min zêdebarê vê yekê ku weşana Agirî di biyava form û logoyê de kariye wek rojnameyekî modern xwe derxe holê, bikare nexş û rolek berçav di nava Kurdên Kurmancên Jorîn de jî hebû û xelkê ji tekoşîna gelê Kurd di Rojhilata Kurdistanê bi pêşengiya PDKÎ heydar bike.


Yanî em dikarin bêjin, pira herî baş bona nasandina siyaset û programên wê partiyê bo parên din yên Kurdistanê bûye. Xebata Agirî, di biyava ziman, çand û rojnamevaniyê de pirr hêja bûye. Her qas tu rojname û weşanek bi bê kêmasî nîne, lê ez erxayînim ku Agirî dê bikaribe bi zêdekirina rûpelên xwe, kêmekê ji fontên girtir mifahê werbigre û valahiyek biçûk di rûpelan de pêk bîne, rûpelên Agirî tejî û tevlihev in. Pêdiviye ku Agirî bîr ji wê yekê bike ku bibe heftane û heftiyê carekê bikeve ber destê xwendevanan. Wê demê dê bikaribe mijar û nûçeyên nûtir pêşkêşî hogirên xwe bike.

Daxwaza serkevtinê ji bo Agirî

www.zinarlaserakurd.org

**Îbrahîm Seydo Aydogan:**

## "Agirî Ji Bo Baştirkirina Kurdiya Xwe Tim Bi Kesên Ku Di Warê Zimên De Dixebitin, Re Ketiye "Peywendiyê



**Îbrahîm Seydo Aydogan Doktorayê Zimanê Kurdî**

**A**girî yek ji wan weşanên kurdî ye ku cih da nivîsên pirrhêl û guh neda nasnameya nivîskar ya siyasî. Ev yek cihê guherînekê ye ku tovên xwe ji çanda PDKÎ werdigire, lewre di nava vê rêxistina navborî de tim xatirê kes û civatên ji derveyî wan jî hatiye girtin. Agirî herweha ji bo baştirkirina kurdiya xwe tim bi kesên ku di warê zimên de dixebitin, re ketiye peywendiyê û nebûye weke hin weşanên ku li kesî guhdar nakin. Berpirsên Agiriyê li cem kê zanînek hebe, xwe digihîne. Ev jî îmajeke erênîtir di serê mirov de di derheqê vê kovarê de ava dike û wê mezintir dike. Ê ji ku tê, ev nefspiçûkî û birçîbûyina fêrbûyî nê? Gava ku mirov Azad Kurdî'yê berpirsê kovarê nas dike, hingê mirov di cih de fahm dike ku ruhê hin weşanan bi rastî jî ji berpirsên wan tê. Lewre kubarî û dilovaniya Azad Kurdî di hemû peywendiyên kovarê re eşkere dibe. Digel ku di warê zimanê kurdî de keseskî zana û têr e jî, û pirr baş hakimî herdu zaravayên kurdî ye, tim dipirse û dixwaze hîn bibe.

Agirî li nava welêt ji aliyê Pêşmergeyên kurd ve tê amadekirin, lê nikare xwe bigihîne her devera welêt. Digel vê jî berpirsên wê teknîka îroj baş bi kar tînin û kovarê bi dilê xwe li ser înternetê jî diweşînin û herweha bi rêya emailan ve dişînin ji xelkê re. Ev yek nîşan dide bê ew çendî ji dil dixebitin.

Bi tenê rexneyek heye ku mirov dikare li Agiriyê bigire û ev kêmanî jî rasterast ji Agiriyê nayê û dikare bi hêsanî were sererastkirin.

Ji ber ku hejmara nivîskarên kurd kêm e û ji ber wê jî ya berhem kêm e, carinan, hema çi hebe mirov diweşîne. Ev kêmanî li cem hemû kovar, rojname û malperên kurd heye û ne bi tenê kêmaniya Agiriyê ye. Carinan mirov hin nivîsan tê de dixwîne ku pê ecêb dimîne. Agirî divê asta hilbijartina nivîsan hinekî din jî bilind bike. Hemû nivîsan nexe kovarê. Heger Agirî hilbijêr be, ew feraset tê de heye ku bi hêsanî bi ser bikeve û bibe referanseke baş.

Agirî weke hin kovar û rojnameyên me yên din di bin banê rêxistinekê de derdikeve. Herçend çanda vê rêxistinê ya demokrat di gellek waran de karê weşanê hêsantir bike jî, di naveroka kovarê de mohra rêxistinê pirr eşkere ye ku mirov dikare vê jî weke rexneyekê pêşkêş bike. Kovarek bêguman dikare ji aliyê rêxistinekê ve were amadekirin, lê ne mecbûr e ku "rêxistinî" tev bigerre. Ev rêxistinîbûn dikare ji kovarê re bibe hêzeke xurt û di avakirina çandeke wêjeyî û zimanî û herweha di avakirina çandeke neteweyî ya "kurdayetî"yê de piştgiriya wê bike. Di nava Hizbê de ew çanda toleransê heye ku tim bûye hêza wê û bûye sedema ku mirov piştgiriya wê bike. Ez baş bawer im ku serbestiya ku di vê kovarê de heye, di kêm weşanên rêxistinî de heye.

Weşaneke 15 rojî, dûrî rojeva cîhanî û Kurdistanî dimîne. Hêviya min ew e ku Agirî bêtir cih bide rexne û nirxandinên siyasî, yên wêjeyî, yên çandî, cîh bide lêkolînan û ferqa xwe û weşaneke rojane baştir diyar bike. Lewre weşaneke bi vî rengî ji bo celebên nirxandinî û lêkolînî derfeteke bêhempa ye. Heger Agirî bixwaze, dikare vê derfetê mezintir bike û bike hêzeke kurdayetiyê ku di destê kesî de tune ye.

100 hejmar bila gava destpêkê bin... Em hezar hejmaran jî bi xêr bibînin.

Silavên biratiyê...

**Gabar Çiyan:**

## "Agirî, Rûpelên Xwe Bi Zimanê Neyaran Re Par/Pay Nake. Bi Kurdî Dinivîsîne"



**Gabar Çiyan Gerînendeyê giştî yê ajansa serbixwe ya "Zarathustra News"ê û rêvebirê EuroKurd Human Right'ê.**

**N**êzî du salan in ku Rojnameya Agirî dixwînim. Ez hewil didim ku ji paca xwe, xeta rojnamê li pirsên rojnamevaniyê, ziman, çand û kurdewariyê fêm bikim.

Agirî, rûpelên xwe bi zimanê neyaran re par/pay nake. Bi kurdî dinivîsîne. Ji zimanê farisî, tirkî û erebî dûr dikeve. Bi kurdî hizir dike, dîtinên xwe bi kurdî formule dike û bi kurdî dide xwendevanan.

Agirî, diyalektên kurdî li hev nêzîk dike. Cî dide tevan. Di rojeva wê de, **"hilbijartin û bihêzkirina diyalektekî û redkirina ya/yên din"** tune ye. Ji bo nêzîkbûna diyalektan li hev rêya herî mantiqî hildibijêre û xebatên xwe bi tîpên latînî dike.

Dema mirov li dîroka Rojnamegeriya Kurdî dinêre, di weşandina wan de berdewamî tune ye. Piştî 20 anjî 30 hejmaran weşana wan radiweste.

Agirî yek ji wan rojnemayên kurdî ye ku li ser pirsa berdewambûna weşanê, bi biryar e, bi israr e. Di 6 salan de, 100 hejmarên wê derketine. Ev alî divê bê dîtin, bê qalkirin.

Navenda Agirî bi pêkanîna hevpeyvîn û analîzên cewaz, belavkirina nûçeyên ji Kurdistanê, û nêrînên xwe li ser pirsa çand û edebiyatê gavên hêja davêje. Her wisa têkiliyê bi Medya Kurdî re datîne, cî dide xebatên wan, anjî hevkariya xwe bi wan re xurt dike. Ev yek di rûpelên Agirî de eşkere xuyanî dike.

Agirî xeta xwe ya polîtîk heye. Lê xeta wê, rê li ber nagire ku xebatê bi hizrên cewaz yên neteweî re bike. Li ser esasê berjewendiyên neteweî, rûpelên xwe bi rojnavenanên Kurd re par/pay dike. Agirî, bi vê helwêsta xwe, rojnamevaniya xwe bi hevkariyên nû re xurtir dike. Gavên berfirehtir davêje. Neteweîtir dibe, cî û nirxê xwe bilind dike.

Agirî di rûpelên xwe de cî dide xebatên edebî. Nirxandina pirtûkên nû, hevpeyvînên cewaz rengên balkêş didine rûpelên wê.

Rojnameya Agirî ji gellek aliyan ve baş e. Pêşve diçe. Pêşniyarên min ev in:

Analîz û gotarên polîtîk car caran bi şêweyekî konsantrebûyî di rûpelên rojnamê de cî digirin. Dikare di şûna wê de, weke mîsal hevpeyvînên polîtîk cî bigirin. Bi rêya wan, xalên balkêş bêne hilbijartin û mesaj bêne dayîn.

Sernivîsên rojnamê "manşêt" ji awira rojnamevaniyê ne profesyonel in. Zêde ne balkêş in. Divê xebat li ser bê kirin.

Pirsên "**mafê mirovan**", "**Maf û çalakiyên jinan**", "**pirsên aboriyê**", "**magazîn**" û "**gel û olên li Kurdistanê: Asurî, Êzidî, Ermenî, Cuhû**" zêde xuyanî nakin. Divê ev xal neyêne jibîrkirin.

Salvegera 6emîn ya Agirî'yê pîroz be. Gellek spas ji bo tevayî xebatkarên wê ku vê xebata hêja dikin. Spas ji bo helwêsta Agirî'yê ya Kurdistanî.

Hêviya me ew e ku, agirê Agirî'yê mîna volkanên Çiyayê Agirî be: Tirsê têxe dilê neyaran, û li ser navê Rojnamegeriya Kurdî gavên mezintir bavêje û dilê me kurdan geştir bike...

www.arsivakurd.org

**Silêman Keleşî:**

## "Divê Hevalên Agirî Baş Xwe Bihesin Û Bizanin Çi Erk Û Wezîfên Giran Ser Milê Wan E"



**Silêman Keleşî**
**Siyasetvan**

Pêş hemû tiştekê îcazê bidin ku ez pirr bi dil û can, şeşemîn salvegera dayîkbûna rojnama Agirî pîroz bikim li hemû wan hevalên ku di wê rojnamê de zehmetê dikêşin, hêviya serkevtinê bo wan hevalan bixwazim.

Ewa rastî be, mixabin min nekariye ku hemû hejmarên rojnama Agirî bixwînim, ewa ku rojnama Agirî, dê wê carê sedemîn hejmara xwe bêwestiyan bi wan îmkanatên kêm yê ku hene diweşîne, ew berdewamî û newestan bi hêz û qaweta xwe, ewa serkevtineke mezin e ji bo hevalên Agirî.

Hewce ye bête gotin, her kesê ku hejmarên destpêka rojnama Agirî xwandibin, baş pê dihese ku Agirî çawan pêngav bi pêngav ji hemû aliyan ve dewlemd bûye, û xwe gihîjandiye astekî bilind a rojnamevaniyê û her wiha kariye bala gellek xwendevanan di nav civaka Kurdî de bikêşîne ser xwe, bi hizra min li gor wan îmkan û derfetên ku ber destê rojnama Agirî de hene, kariye bi başî pêşve biçe û ji erk û wezîfên xwe bo xizmetkirin bi ziman, çand, rewşenbîrî û rojnamegeriya Kurdî de serkevtî bûye.

Ez dixwazim ji vê derfetê mifahê werbigrim û di yek paragrafê de basa girîngiya cîyê Agirî bikim di nava hemû rojname û govarên ku li Rojhilatê Kurdistanê (çi li hundir û çi li derveyî Kurdistanê) tême weşandin.

Rojnama Agirî cîyekî pirr girîng û xasmayî heye di nav rojname û kovarên Rojhilatê Kurdistanê de, ber hindê heta wî cîyê ku ez bizanim rojnama Agirî yekmîn rojname ye ku bi tîpên latînî û bi zaraveya Kurmacî di vî parçeyê Kurdistanê de derdikeve, divê bête xuyakirin ku bi milyonan Kurdên me hene ku nikarin bi tîpên erebî bixwînin û binivîsin, ji ber vê yekê rojnama Agirî dibe pirek bo agadarkirina bi milyonan Kurda li ser rewşa Kurdistanê bi giştî û nemaze Rojhilatê Kurdistanê, lewra divê hevalên Agirî baş xwe bihesin û bizanin çi erk û wezîfên giran ser milê wan e.

Li ser rexne û pêşniyaran: Min çi rexne li rojnama Agirî ninin, lê min rexne li xwe û gellek hevalên wek xwe hene ku me nekariye li gorî hewce alîkariya hevalên Agirî bidin, renge gellek kes ji nêzîk ve nezanin ku ew rojname bi çi îmkanatekê û di çi zirûfekê de çap û belav dibe, lêbelê ez dizanim, bi rastî eger ew hevalên ku di Agirî de kar dikin fidakariyê nekin, rojname bi wan îmkanatên ku wan hene, bi vî awayî têrnaverok û xweşik der nakeve, destê wan sax be û her bijîn bo gelê Kurd.

Herwisa hêvîdarim ku Agirî hewil bide bêtir digel komele, civet, sazî û aliyan pêwendiyan bigre bo havkarî û berevpêşbirina armancên xwe, ew xebata ku hûn di wê pişka Kurdistanê de dikin xebateke pîroz e, hewcehiya wê bi rêxistin û civatên sivîl heye ku bikarin wan hemû şanazî û xebatên ku wê derê hatine kirin û têne kirin, bi hemû Kurdan û derdorê bide xuyakirin, hêvîxwaz im ku civat û saziyên we bêne avakirin û mil bi mil rojnama Agirî xebatê di hemû warên hewce de bikin, ji bo agadariya we hevalên hêja û xwendevanên we yên bi rûmet hewleke zaf heye bo avakirina civateke sivîl bo aştî û pêşveçûnê, hêvîdarim ku her çi zûtir mizgîniya avabûna wê jî di rojnama we de bête belavkirin.

**Ebdula Hicab:**

## "Agirî, Bi Hîmê Hin Xebatkarên Bi Îrade, Ji Tunetiyê Dest Pê Kir Û Di Demek Kin De Bû Xwediyê Kultûrek Berz A Nivîsê"



**Ebdula Hicab**
**Siyasetvan**

Di destpêkê de, pîrozbahiyê dibêjim kargêr, hemû xebatkar, nivîskar û xwînerên **Agirî** û berhema 100'mîn ji dil pîroz dikim. Ji bo min 30'ê meha 11 heya niha 2 rojbûnên bi nirx bûn, ji niha û pê ve ew munasibet dibe 3'yemîn rojbûna hêja ku ezê bi hev re ewan pîroz bikim.

Agirî, bi hîmê hin xebatkarên bi îrade, ji tunetiyê dest pê kir û di demek kin de bû xwediyê kultûrek berz a nivîsê. Ew şop dê her tim di edebiyata hevçerx ya Kurdistanê de zindî bimîne û li ser xebata nivîskî a nivşên tê karîger be.

Li Rojhilatê Kurdistanê, edebiyata kurdî a bi zaraveya Kurmancî bi *Agirî* re kete ser rêbazek sererast a nivîs û weşanê. Heya dema li daybûna *Agirî,* vir de wê de, carna weke paşpirtik, carna ji bo xeml û hin caran jî bi zext û hewla hin dilsozan çend rûpelên kurmancî di hin kovaran de dihatin weşandin. Ew nivîs pirranî bi selîqeya kesan ve girêdayî bûn û kêmtir diketin xaneya weşana berdewam ku mirov bikaribe wan binirxîne. *Agirî* di gel rêbaza nû, hem rêçikek edebî danî û hem ji wan hewlan re xwedî derket.

Niha eger mektebek nû ya nivîsê jî nebe, *Agirî* bûye saziyek weşanê û çavkaniyek bi nirx e ji bo hemû kesên di warê edebiyat û rojnamevanî û nivîsê de li Rojhilata Kurdistanê kar dikin. Ew hewl dê bibe bingehek ji bo gulvedana edebiyatê û pêşveçûna rojnamegeriya Kurdî.

Bi temenê xwe ê kurt, lê pirr ji kar û berhem *Agirî* niha hêviyek e. Ez bawer im ew hêvî dê hêj xurt be, dema *Agirî* pitir giringiyê bide hêlîvanka xwe, an herêma ku pê dijî û bo dijî. Rewşa civakî, kultûrî, zimanevanî, edebî û siyasî di herêmên Kurmancîaxiv yên Rojhilata Kurdistanê, ji çemê Erez ve bigre heta Şino û li komelgehên Kurd ên Rojhilata Îranê, weke Qoçan, Xurasan û hwd serekaniyên herî xurt ên berhem û basan e. *Agirî* çend ji wan serekaniyan xwe têrav bike, dê hin qas xurt be.

Dubare pîrozbahiyê dibêjim we û di weşan û xebatê de ji we re serkevtinê dixwazim.

**Arjen Arî:**

## "Agirî Bi Qasî Destdayîna Derfetan Rûpelên Xwe Zêde Bike"



**Arjen Arî**
**Nivîskar**

Bi hilkevta hejmara 100'mîn û 6'emîn salvegera weşana rojnameya Agirî, di destpêkê de destxweşiyê didim hemû kesên ku heta vê hejmarê bi nivîs û gotarên xwe rengîniyek dane weşana rojnemeyê. Weke kesekî ku carinan bi nivîsekê beşdarî rûpelên Rojnameyê dibe; pêşniyara min ew e ku Agirî bi qasî destdayîna derfetan rûpelên xwe zêde bike û hewl bide ku nivîskarên li çar kenarên xaka dabeşkirî; bi nivîsên cur bi cur rengîniyekê, pirdengiyekê hilgirin rûpelên Rojnameyê.

Bi van hest û dilinan hejmara 100 li xwedî, rêveber, desteya weşanê û nivîskar û xwendevanên kurdî/kurmancî pîroz dikim.

Bi hêviya hejmarên li ser axeke azad, weletekî azad, bi al û bi refş û serbixwe...

## Redaksiyona Dengê Azad




Em, ber her tiştî ji bo 6'emîn salvegera weşana Rojnameya Agirî we pîroz dikin. Mixabin, welatên ku Kurdistan dagir kirine hê jî polîtîkayên xwe yên nijadperest li ser zimanê Kurdî û çapemeniya Kurdî didomînin. Di nav van polîtîkayên nijadperest de rojnameyeke Kurdî ku 100'emîn hejmara xwe çap dike, gellek girîng e.

Her çiqas bûyîna weşaneke partiyekê ku di rêya bernama xwe ya bingehîn de tiştên ku ji xwe re kirine armanc, pirr eşkere û paqij anîne ziman û di vî warî de hewldanên wan hêjayê rêzgirtinê ye. Ji bilî viya ji bo tekoşîna azadî û wekheviyê zext û zordestiya li beranberê sîstema Îrana paşverû, rawestiye.

Li gor me nûçeyên Rojnameya Agirî ya herî balkeş ev in ku newekhêviya civatên Îran û Rojhilata Kurdistanê bi bîr û boçûnê agahdariya xwendevanên xwe dikin.

Em bi navê malpera Dengê Azad hêvî dikin ku di nav axa dagirkirî yên Kurdistanê de tu weşanên Kurdî ya nirxên neteweyî daniye pêşiya xwe, nehên rexnekirin, lê divê ji her alî ve piştgirî û piştevanî bê kirin. Ji ber vê hindê em careke din bo 6'emîn salveger 100'emîn hejmara Rojnama Agirî we pîroz dikin û serkeftinê dixwazin.

**Enwer Kohensal:**

## "Hewil Bidin Ku Beşa Raportaj Û Pirskirin Li Xwendevanan Her Tim Di Agirî De Xuya Bibe"

Serkevtin ji we rêveber û xebatkarên weşana Agirî re.

Sipas ji boy wê derfeta ku we dayî min heta ku ez jî hizir û nêrînên xwe li ser çawaniya kar û xebata Agirî bînme ziman ...

Ji ber ku di dîroka rojnamegeriya kurdî de li Rojhilatê Kurdistanê ewa yekem car e ku weşanek bi zaraveya kurmancî ya zimanê kurdî û bi tîpên **latînî** derdikeve, bi xwe pêngavekî pirr hêja û cihê nirxandinê ye. Lewma heke di kar û keddana we de kêmasiyek jî bête berçav, mirov divêt her bi çavekî erênî û pozîtîv çav lê bike.


**Enwer Kohensal**
**Nivîskar**

Bi nêrîna min, weşana 15 rojî a Agirî karî ye di heyamê wan çend salên derbasbûyî de xizmeteke gellek balkêş hem ji aliyê rojnamegeriyê û her wisa ji aliyê rêzimanî ve bi çand û wêjeya kurdî bi zaravê Kurmanciya Jorîn bike ku heya vê gavê ji aliyê çi rêxistin û saziyan ve nehatibû kirin.

Ez her demekê ku Agirî dixwînim, çend bûyerên dîrokî dikevine bîra min. Şorişa mezin a qehremanê dîroka Agirî **"Êhsan Nûrî Paşa"** ku çawan xebateke mezin di bin qontara çiyayê Agirî de da meşandin û Agirî hertim rûsipî hêla, hêza bihêz ya Agirî di dîroka Rojhilatê Kurdistanê de ku gellek xort û qîzên wan herêman xwe kirin gorî û dastanên wisa xuliqandin ku hertim di dîrokê de bi mêrxasî nav lê tê birin, û cara yekem bi serperestî û peşniyara min rojnama Agirî a dîwarî me da meşandin ku ew bi xwe bû bingehek ku em li ser wî xîmî bikarin kar bikin û agirê Agirî carek din germ û gurrtir bikin ...

Ez pêşniyar dikim ku hûn bikarin di hejmarên tên ên Agirî de zêdetir kar bikin li ser rastnivîs û rêzimana kurdî û her wisan quncikekê jî ji boy gotinên pêşiyan vebikin. Hewil bidin ku beşa raportaj û pirskirin li xwendevanan her tim di Agirî de xuya bibe.

Carek din ji were serkevtinê dixwazim û dibêm her tim mehit ji keda we re.

**Besam Mistefa:**

## "Bila Her Û Her Xebata Bê Rawestan, Xwendina Bê Westan Bi Zimanê Dayikê Bibe Dirûşma Me Û Tevahiya Xwendevanên Agirî"

Rojnameya panzdehrojî ya Agirî îro digihîje hejmara xwe ya 100-î. Bi vê boneya hanê ez weke nivîskarekî berdewam yê Agirî û xudanê quncika bi navê "**Dengê Rojava**" di vê rojnamê de, derketina vê hejmarê li xwendevanên Agirî û zimanê kurdî pîroz dikim.


**Besam Mistefa**
**Helbestvan û Nivîskar**

Lê ji pîroziyê wêdetir, divê hewlên me yên ji bona çespandina kultûra xwendinê di nav gelê me de qet ranewestin û her berdewam bin. Kultûra xwendinê hêjî ciyê xwe bi tundî û qayimî di nav milletê me de negirtiye. Her kes dizane, bê xwendin ne mirov û ne civak û ne jî welat bipêş nakevin, ji ber ku jiyan weke rûbarekî har her di rewşa herikînê de ye, kesê yan gelê xwe pêre nagehîne dê ne tenê di cihê xwe de bimîne, lêbelê dê li paş bimêne û bipaş bikeve.

Derketina 100 hejmaran ji rojnameya xweşik a Agirî, kevirekî berçav di dîwarê çanda me de lêdike û gaveke din berê civaka me dide berbi kultûra xwendinê ve, nemaze xwendina bi zimanê dayikê.

Bila her û her xebata bê rawestan, xwendina bê westan bi zimanê dayikê bibe dirûşma me û tevahiya xwendevanên Agirî.

Serkevtî bin, xebat berdewam bin!

**Şehab Xalidî:**

## "Agirî Walahiya Weşaneke Kurmancî Bi Tîpên Latînî Li Rojhilatê Kurdistanê Tejî Kir"

Seba derketina 100'mîn hejmara rojnameya Agirî, ez bi dil û can pîrozbahiyê li we xebatkarên Agirî dikim.

Her wek em dizanin, cara yekemîn li Kurdistana Îranê li serdemê **Simkoyê Şikak** de bû ku rojnameyeke Kurdî, ew jî bi tîpên Latînî derdiket. Ew rojname bi biryara Simkoyê Şikak û bi alîkariya **Ebdulrezaq Bedirxan** bû. Derketina rojnameyekî bi vî awayî di vê serdemê de, nîşaneya girîngîdana wî rêberî bi ziman û toreya Kurdî bû. Piştî vê rojnameyê êdî çi rojnameyek ku bi tevahî bi Kurdî û bi tîpên Latînî be, belav nebûye. Lewra ew yek valahiyek bû ku bi jidayîkbûna Agirî tejî bû. Ewa jî serbarê vê yekê bû ku seba rewşa xebatê ya li derveyî welat, çi di warê aborî de yan jî di warê personelî de gellek qels û lawaz bû. Lê we îsbat kir ku bawerî û îrade, dikare mirov bigihîne serkevtinên çavnihêrnekirî û astên bilind.


**Şehab Xalidî**
**Rojnamevan**

Ji aliyekî din ve seba vê ku pirraniya Kurdan niha bi tîpên Latînî dixwînin û dinivîsin, lewra renge nekaribin bi başî agahdarê rewşa Kurdistana Îranê bin. Lê bi weşandina rojnameyekî bi tîpên Latînî, hûn bûne pira têkiliyan di navbera wan Kurdên ku bi tîpên Latînî dixwînin û dinivîsin, çi li derveyî welat û çi li beşên din ên Kurdistanê.

Ez pêşniyar dikim:

1. Rûpelekê bo mijarên bi devoka Soranî bi tîpên Latînî dabinên.
2. Agirî bila heftîname be û her 7 rojan carekê derkeve.
3. Ger bi awayê rengî bê weşandin dê pirr baştir be.
4. Rûpelekê tenê bo nûçeyên wêneyî dabinên.

www.arsivakurdi.org

agiri

Duheftînameya siyasî, civakî, çandî û hunerî
Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne

http://www.kurdistanmedia.com/kurmanci/index.php
Navenda bingehîn ya xebata Agirî li Kurdistanê ye.
Navnîşana derveyî welat: AFK B.P. 102- 75623 Paris CEDEX 13 –FRANCE

E - Mail:
agiri2003@hotmail.com
agiri2003@gmail.com



# Şandeke PDK Serdana PDK Îranê Kir




Roja çarşem, 26.11.2008'an, şandeke payebilind ya Partiya Demokrat a Kurdistanê bi serokatiya **Fazil Mîranî**, Sekreterê Mekteba Siyasî û **Azad Berwarî**, **Mihemed Melaqadir**, **Mehmûd Mihemed**, **Mesûd Saleyî**, **Izedîn Berwarî**, **Remzî Şeban û Salih Delo**, endamên Mekteba Siyasî û Komîteya Navendî ên PDK'ê, serdana Deftera Siyasî a PDK Îranê kirin ku ji aliyê şandeke vê partiyê bi serokatiya **Mistefa Hicrî** ve bi germî hatin pêşwazîkirin.

Di hevdîtina han de Fazil Mîranî, bi hinceta serkevtina 14'mîn kongireya PDKÎ, pîrozbahiya xwe û PDK'ê pêşkêşî PDKÎ kir. Piştre Mîranî li ser rewşa siyasî a dever, Îraq û Kurdistanê basek pêşkêş kir û di axavtina xwe de qala destkevtên bizava rizgarîxwazane a Kurd di Kurdistana Başûr de kir.

Di doma hevdîtinê de Mistefa Hicrî, li ser rojeva kongireya 14'hem a PDKÎ, bas û mijarên kongirê û encama wê, axivî. Wî herwiha li ser rewşa siyasî ya Îran û Rojhilatê Kurdistanê basek pêşkêş kir.

Di dawiyê de her du aliyan li ser berfirehtirkirina pêwendiyên di navbera hevdu de tekez kirin.

# Hejmara Cemik (2-3) A Kovara 'K 21'ê Çap Û Belav Bû



Hejmara cemik (2-3)a kovara werzî a kutûrî, zanistî, dîrokî û netewî ya 'K 21'ê bi awayek bedev,balkêş û têrnaverok çap û belav bû.

Kovara han bi ked, zehmetî û mandîbûn rewşenbîr û xemxorê gelê kurd û serniwîskarê wê kovarê, **Momtaz Heyderî** ve tê weşandin.

Kovara han ji 828 rûpelan pêk tê û têde gellek babetên girîng û balkêş li ser kurd, dîrok û zimanê kurdî tên dîtin. Hebek ji vê kovarê jî gîhîşt pirtûkxaneya Agirî.

Em wekî Desteya Weşana Agirî tevî destxweşî û pirozbahîkirin ji birêz **Momtaz Heyderî** û hevkarên wî, hêviya berdewamî û serkevtinê di kar û xebata pîroz ya wan de dixwazin.

# Komîsera Mafê Mirovan Ya NY'ê, Domkirina Tund Û Tûjiyan Li Dijî Jinan Rexne Kir



"Naventhem Pillary", Komîsera jin a Konseya Mafê Mirovan a RNY'ê got: serbarê vê çendê ku 9 sal li ser binavkirina Roja Cîhanî a Jiholêrakirina Tund û Tûjî Li Dijî Jinan derbaz dibe, lê hêj ev fenomene bi xurtî li ser jinan li seranserê cîhanê dimeşe û em bi vê yekê gellek nigeran in.

Bi vê hilketa cîhanî jî, Ban Kî Mon, Sekreterê Giştî yê NY jî daxuyaniyek da çapemeniyê û got ku tund û tûjî li dijî jinan, tund û tûjî li dijî pêkanîna aştî û ewlekariya cîhanê ye.

Ji sala 1999'an şûnde ji aliyê RNY'ê ve Roja 25'ê Çiriya Paşîn weke Roja Jiholêrakirina Tund û Tûjî Li Dijin Jinan hatiye ragehandin.

# Li Bajarê Sine Goreke 3000 Salî Hate Peydakirin



Di çend rojên borî de, demekê ku bona firehkirina rêya navbera bajarokê Hesenava bo bajarê Sine kar dihat kirin, 5 gorên dîrokî hatin peydakirin. Tê gotin ku dîroka van gorên kevnar vedigere 3000 salan berî niha.

Li gor gotina çavkaniyên têkildar, termê yek ji Paşayên ku di wê gorê de hatiye dîtin, di cîhanê de bêmînak e û ji aliyê rayedarên Komara Îslamî a Îranê ve hatiye bêserûşûnkirin.

Xelkê Kurdistanê li hember vê kiryara dezgehên rejîmê bêzar û nerehet in ku bi vî awayî cihwarên dîrokî yên Kurdan bêserûşûn dixin.

www.arsivakurd.org